

ROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



3
1983

NAVEROK

Rûpel

J1 Xwendevanan	4
Vekolinek L1 Ser Navên Mehan	6
Hevpeyvînek B1 Kemal Fuat Va	10
Defina Peyvên Kurdi	12
Mamosteyê Folklorê Kurdi	
Prof. Heciyê Cîndî	18
Biranînek L1 Ser Gora Ahmedê Xanê	20
Disa Şîlî Disa Şîlî	22
Helbestek Û Rexnek	25
Diwar	27
Zımanzaneke Kurd ; Zera Ûsiv	28
Bendên Pêşîyan	30
Komcivîna Kurdologan	31
Dengbêjeki Kurd; Yêzdiyê Botî	32
Ku Sûk ev Sûk be	33
J1 Nav Weşanan	36
10 Saliya Mîrîna Pablo Neruda	38

SAL : 5

HEJMAR 46

Xwedî : Komela Karkerên Kurdistan
L1 Swêd

Berpirsiyar : Rohat
Navnişan : Karlbergsv. 32B. nb
113 27 Stockholm


Telefon : 08-328251
Hesap No : PG. 458980-0

Utgivare : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen

Ansvarig Utgivare : Rohat
Adress : Karlbergsv. 32B nb
113 27 Stockholm

PG. : 458980-0

DU KOMÊN MUZIKA ZAROKAN



Koma Zarokên bajarê Dihokê



Koma Zarokê bajarê Suleymaniye

SURIYE

J1 bo kovara Roja Nû

Ez sîlavên şoreşgeri pêşkêşî we dîkîm. Hêviya min ewe ku kovar roj b1 roj bîghêje armanca xwe û em hemû bîghêjine azadiya welatê xwe.

Hevalno !

Bê guman roja ku min kovara Roja Nû dit, ew hejmara duwemin ez pîr dîlşad kirim. Ew kovara yekemine ku b1 tehreki torevani (hunerî), çandi û cîvaki derdikeve û daxwaza me tine cih. J1 ber ku, gotar, nivîsar û ef-randinên têda çapbûne girîngiya doza zîman û tore nişani me didin. Vîr şûn da ezê çirok û helbestên xwe l1 ser adrêsa we rê bîkîm ku, ez ji bîkarî-bîm şîsîkekê bavêjim nav himên ku pê diwarên hunera me ava dibe.

Spas j1 bo hemû karên Roja Nû.

Rêberê Koban

LÎBYA

Ez gelek sîlavên şoreşgeri bo we rê dîkîm. Min Roja Nû hejmara yekemî wergirt û zor spas dîkîm. Pêwîste hemû xwendevanên ronak bîghên hev du, ev yeka b1 rasti karekî pîr baş û hêjaye. Dema ew yekgav xwe têxîn bîn xebata çandi û hunerî, gelê me wê hîn ji pêşta here. J1 ber ku bandura (tesîr) hûner dî jiyana gelan da geleki bîlînd û kûre.

Ez serketîna û pêşketîna we dî-xwazîm.

Heyderê Omer

SWÊD

Ez kovara Roja Nû ra serketîna û serfiraziyê dîxwazîm û helbesteke xwe pêşkêşî we dîkîm.

Bê rêberîm, bê gumanîm, bê evin
Bê bîharîm, bê dîldarîm, bê kenin
Bê giyame, bê çiyame, bê ribar
Bê hevalîm, bê delalîm, bê nazdar.

Ez dînalîm, her bê halîm, bê xwedan
Ez bê kesîm, xerîb ezîm, bê sermiyan

YUWANAN

Çawa hûn ji dîzanîna, hêzên kolon yalist j1 bo temîrandîna çand, huner û hebûnên gelêrî, b1 rasti dî nav xwe da ketîna leceke (hucet) mezin û dîbezîna. J1 ber vê yekê j1, l1 ser gelê me van hêzên kevneperest zordest tîke şovenîst pêk anîne û ew l1 gelê me hatîna xezebê

Lê, gelê me êdî hîşyar bûye û gelê me wê b1 serkeve.

Dî nav van hoy û mercên dijwar da tekoşîna azadiyê tu wext neseke nî ye û nasekîna j1. Îro, j1 welatê me dîr, l1 van welatên biyanî, karên l1 ser çand, huner û zîmanê kurdi l1 lez pêşta dimeşîna, ev yeka me pîr kêfxweş dîke. Dî vê çarçevê da nave-reka kovara "Roja Nû" pîr dewlemende, mirov dikare her tîştî têda bîbine, pîr tîşt heta niha hebûn, b1 rasti me haj pê tunebun. B1 saya kovara Roja Nû em j1 van tîştan aqahdar bûn. Me Roja Nû l1 Kampa Tavroîn belav kir û kêfa pîr kesana b1 vê kovara kurdi hat.

Fadîl SUNA

ELMANYA

Berî her tîştî pîr sîlavên şorege ri, dîlsozî û niştîmanî wera rê dî-kîm, zor spas j1 bo karên weyî bê westan. Ez j1 wera û gelê kurdi ra serketîna û serfiraziyê dîxwazîm.

Hevalên delal,

L1 Elmanya Rojava l1 bajarê Han nover herdu hejmarên "Roja Nû" ketîna destê min, min ewana b1 dilekî xweş û feraş xwendîna. Ez pîr kêfxweş û dîlşabûm, j1 ber ku ez bawer dîkîm, Roja Nû wê roleke mezin û giranbîha dî warê pêşvebirîna çanda kurdi da bilîze.

Ez bê bavîm, ez bê dême, bê bîra
Bê xwîşkîm, bê şemdan, bê çîra.

Bê seyranîm, bê gerhanîm, bê awaz
Bê gulperîm, bê dilberîm, bê evin
Bê bîharîm, bê dîldarîm, bê kenin
Belê b1 hêvîme, b1 umdîm, b1 daxwaz.

Serbest Zaxolî

JÎ XWENDEVANAN

AVUSTRALYA

Kovara Roja Nû, hejmara yekemîn gihîşte destên me. Bî rasti Roja Nû bî awaki xweşik û bî nivisarên giranbîha va hatiye weşandin. Em, hevalên ku vê kovarê çapdikin, jî dil spas dîkin û em hêvîdarin ku, ew jiyina xwe bide ajotin. Bî rasti derxistina kovareke bî zîmanê kurdi dî rojên iroyin da ne hêsaye. Daxwaza me ewe ku kurdên lî dervayî welat diminin, bî zanetî zîmanê kal-bavên xwe pêşva bibin, kovar û rojnamên bî zîmanê kurdi bixwinin. Heta jî destê wan tê jî bî awaki aborî û bî awayên din alikariya vê kovarê bikin. Ez redaksiyona Roja Nû bî navê endamên Komela Kurdên Australya pîroz dîkim, pêşveçûn û kêfxweşiyê jî bo hemû kurdên lî Swêd hêvî dîkim.

BEKİR ŞAHİN

Bî navê

Komela Kurdên Australya

ROMANYA

Berî gîştî, ez sîlaveke pîr germ lî we dîkim. Ez xwendekarekî kurdên Suriyême û nîha lî Romanyê dîxwinim. Dema ku min Roja Nû dît, min tîm xwast ku, dengê me bighê hev û em na siya xwe pêsta bibin. Bî rasti Roja Nû, kovareke ciwan û pêşverûye. Ez dîxwazim çî tîştên peyda dibin û dî destê we da hene, jî min ra rê bikin. Bî vî tehrî em jî dîkarin diroka (mêjû, terix) xwe av bîdîn û çanda xwe pêsta bibin.

Remê Hemo

ELMANYA

Hevalên hêja û delal,

Kovara Roja Nû gelek giranbîha û bî rûmete, bî rasti ew pîr qence. Ev kovar kulmeke mezin û girane ku, em karibin bî alikariya xwe û ronakbîrên kurdan vê kulmê lî nav çavên dij minên xwe da lêxin. Jî ber ku, ew dij minên koledar hebûna gelê me nabinin. Ev xebat û kovara we, ez bawer dîkim wê xewnê wan birevine û direvine jî.

ELMANYA

Bî rasti derxistina kovareke min a "Roja Nû" jî bo huner û çanda kurdî, dîlxweşiya her kurdeki welatparêze. Bî rasti, ew bî şêweyeki ciwan û dilvekirî hatiye amadekirin. Ez gelek bawerim ku, kovara me "Roja Nû" wê cihê xwe dî dilê hemû hevalan da bigre.

Pêştabîrîna kovara "Roja Nû" xebateke mezîne dikeve ser milên me hemûyan. Bî rasti her gelek bî zîman û kultura xwe tê naskirin.

Salîmê Casîm

Emsdetten-Elmanya Rojava

Şukri Abo

Romanya

FRANSA

Bîrayên Berêz

Paş sîlavên hevaltiyê, ez hêvî dîkim ku hûn dî karê xwe da serkevin û serbîlînd bin.

Abdullah Mîrdox

FRANSE

LI SER NAVÊN MEHAN



DILDAR BERWARI

Çawa hine kurdzan û zımanzan diyar dîkin, weki Salnama kurdi 700 salî berî bûyina Îsa despêdîke û meha pêşin di nav salê da me ha Adarêye (Mareh). Ji ber vê yekê ji, bi taybetî salnamên kurdi bi meha Adarê va despêdîkin.

Di nav salnama kurdi da 12 meh cih digrin û her navê mehekê, çawa emê bîbinin gelek navên cuda-cuda li xwe kirine. Li çar beşên Kurdistanê an ji li hîn hêlên van beşan da navên mehan bi hev nagrin û ji hev cudane. Ev hevnegrîta (cudabûn) navên mehan realiteke (rastî) folklorîke, mirov nîkare bêje ev yek tiştêki negatîf an jî pozîtîfe. Em dîkarin bêjin, ev cudabûna navên mehan dewlemendî û rengîniya folklorîke kurdi, nişani me dide. Gelê me, li jiyînê, tebiyet, rewş û dorberê xwe nihêriye, jî bo rêvabirîna karbarên xwe hîn nav jî ber xwe derxistiye (efrandîye) û tevî folklorê xwe kirîye. Di bin her naveki mehan da rastîk hatiye veşartî û di warê navkirîna van mehan da daxwazên spontan tu wext rol ne listîne. Dema em li bîngê û himên nava vedîjinî, vedîkolînî, em rastî tiştên pîr hêja tên. Berdayîna fêkiyan, gihîştîna wan, bûyerên çandî-çîninê (dirûn), serma û germa mehan, xweşî û nexweşîya mehan jî bo jiyînê û wek van faktorên, gelek faktorên din jî, di warê navkirîna van mehan kurdi da rol listîne.

Di nav rûpelên xwe da kovara Roja Nû, vê carê wê cih bide lêkolîn û lêgerîneke DILDAR BERWARI, ev nivîsara bi navê "SALNAMA KURDI" bi destê ronakbir û hunervan Dîldar Berwari da hatiye amadekirin. Di nav vê lêgerînê da 12 mehan kurdi çawa cuda-cuda hatî ne navkirin, mebest, ramana her navê mehekê çîye û bi çî babetê hatîne navkirin, di vê çarçevê da salnama kurdi wê bê tavîlkirin û şirovekirin. Di dawîya nivîsarê da jî, xwendevanên me wê listîke navên mehan di sa bîbinî. Ev navên mehan, jî nav hîn salname, ferheng û kovarên kurdi da hatîne berevkirin û li pêşberî hev hatîne rêzkirin, di dawîya wan da jî bi Îngilîzî navên mehan hatîne nivîsandin. Ji bo têgihîştin û zelalbûna hîn pîrsan, behrê jî vê nivîsarê girêbidin, lêkolînê kîrî wan bê, me ev yekê kîrhatî dit.

Dîldar Berwari bi xwe ev çend sale li ser huner, zargotî û edebiyata kurdi serê xwe êşandiye, gelek tişt jî ber devê gel girtîye û ew berevkirîne. Hunervan û lêkolvan Dîldar Berwari heta niha çar xebatên hêja jî bo çapê amadekirîne, wek.

1- Çend rohilatnasên ku li derberêy kurdan nivîsîne: Bi zîmanê Erebi.

2- Têderxistînokên (Mamîk) Kurdi. Pirtûkeke folklorîye, bi zîmanê Kurdi.

3- Bendên Pêşîyan: Bi kurdi.

4- Ferhenga Kurdi û Erebi.

Ji aliyê din Dîldar Berwari li ser çand, huner û edebiyata Kurdan gelek bûna û vekolînên hêja nivîsiye. "Vekolinek li Ser Navên Mehan" yek jî van xebatane.

- 1- Newroz, Avdar, Xakelêw, Axelêwe, Axlêve: MARCH
31 Rojîn, 21 March-20 April

Newroz: Tîştêki xuyaye ku Newroz roja nûye, ango piroziya cejna kurdane ku, beri (4000) car hezar sal pêşi bûyina İsa pêxember peydabûye, dema ku mêrxasê gelê kurd Kaweyê hesinkar serê Dehaqê hov bi gurzê xwe va herîşand û netewê kurd jî zordestiyê rizgar kir.

Avdar: Ango di vê mehê (hiv) da, av, dar û ber mîşe dîbin, zêde dîbin.

Xakelêw, Axelêwe, Axlêve: Ango erd şîn dibe û kulîlk dîbîşkî - vîn.

- 2- Gulan, Banemer, Şestebaran: APRÎL
31 Rojîn, 21 April - 21 May

Gulan: Ango gul dîbîşkîvîn, mina gulnisanoka an jî peqpeqoska Peyva nisanok jî Nisan hatiye, ev peyva bi suriyaniye.

Banemer: Bane, çêringehe, cihe çêreye. Mer jî, tevş û kewalîn, ango di vê mehê da tevş û kewal şevê li çêringeha dimînin, jî ber ku erd şîn bûye û bayê xweş tê.

Şestebaran: Ango di vê mehê da baran gelek dîbare.

- 3- Cotan, Cozerdan, Bextebaran: MAY
31 Rojîn, 22 May - 21 June

Cotan: Cotyar (cotkar) di vê mehê da cot dîkîn, erdê şov dîkîn dikolîn û sero-bîno dîkîn ku qelew bibe jî bo saleke dîn.

Cozerdan: Ango dema çînîna (dirûn) cehe, jî ber ku rengî wi zer dibe.

Bextebaran: Bexte, piçûk û hûr, ango di vê mehê da baranên hûr û sıvîk dîbarîn.

- 4- Xêve, Pûşber, Coxinan, Xıziran: JUNE
31 Rojîn, 22 June - 22 July

Xêve: Xêve navê fêkiyekêye, fêki di vê mehê da dest bi gihîştî nê dîke.

Pûşber: Giha di vê mehê da dibe pûş û hişk dibe.

Coxinan: Coxin, bêder û gêre, di vê mehê da xerman dest pê dîkîn.

Xıziran: Ango erd dîxîzîre jî germê, mina ku dîbêjîn "Xıziran xînzîrî, barê te ket tîrî".

Dûr nine ku navê xıziran jî hezîranê hatîbe wergirtîn, hezîran bi xwe jî peyveke Suryaniye.

- 5- Tirmeh, Xermanan, Miweganan: JULY
31 Rojîn 23 July - 22 August

Tirmeh: Di vê mehê da ava fêkiyan tîr dibe, fêki şilove dîbin û baş dîghên. An jî dibe ev nava pencên royê (tav) va girêdayibe. Jî ber ku tirêja (tir) tavê di vê mehê da gelek dijwar û tûje. Tirêja tavê wek tirane li hindav serê mirovan.

Xermanan: Çaxê gêre û bêderane, xerman dest pê dîkîn.

Miweganan: Ango fêki dîghêjîn, pîlox û şilove dîbin.

6- Tebax, Gelawêj, Gelawêj: AUGUST
31 Rojîn, 23 August - 22 September

Tebax: Teba (tewkırın, qayilbûn) Ango, dı vê mehê da mirov ji axê ra teba dibe. Germ ji bo miştaxên tiriya başe, mina ku dibêjin "Tebaxê, miştaxe ketin axê".

Gelawêj, Gelawêj: Navê stêrkekê (hesar) ye, ku bi engilizi jêra dibêjin "Venus".

7- Kewçerink, Rezber: SEPTEMBER
30 Rojîn, 23 September - 22 October

Kewçerink: Kew bi nav û dengtîrên çivikane (balinde) ku li Kur distanê bûye nişana kurdan, şevên vê mehê wusan ronî û zelalîn ku kew dikarin biçêrin.

Rezber: Ango demê rezane, ku vi çaxi da tiri baş dighên, eger neçînin ba-bagerê wê bibe, lewra dibêjin "Tiriyê îlonê, bi sevyaya çûne". Peyva îlon an ji Eylûl bi suriyaniye.

8- Çiriya Pêşîn, Gelarêzan, Xezalwer: OKTOBER
30 Rojîn, 23 Oktober - 21 November

Çiriya Pêşîn: Çiri, dawiya payizêye. Dı vê mehê da serma êdi dest pê dikin.

Gelarêzan: Gela (belgên darê) dı vê mehê da jı daran dıkevîn û diweşin.

Xezalwer: Xezal, ev navê belgên darêne, rengê wan zer dibe û diweşin.

9- Çiriya Paşîn, Sermawez: NOVEMBER
30 Rojîn, 22 November - 22 December

Çiriya Paşîn: Ango meha dawiyê jı bo payizê, serma û seqemê dest pêkiriye.

Sermawez: Ango sur û seqema vê mehê geleke.

10- Befranber, Kewberdar: DECEMBER
30 Rojîn, 22 December - 20 January

Befranber: Ango dı vê mehê da berf (befr) dibare.

Kewberdar: Berdar bi rûmet, deramet, baş, bi ber. Ango sond û fitina kewan dı vê mehê da pır bi rûmete, jı ber ku, çêrê kewan kême, bi qestana sond û fitina xwe zêde dikin.

11- Befranber duwemin, rêberdan: JANUARY
30 Rojîn, 21 January - 19 February

Befrbara duwemin: Ango, dı vê mehê da berf zor dibare.

Rêberdan: Ango, berf wusan zor dibare, ku rêk û derav têne bend kırım û girtin.

12- Reşemeh, Reşemê: FEBRUARY
29 Rojîn, 20 February - 20 March

Reşemeh: Ango erd êdi bere-bere reş dibe rê û derav vedibin, gel diçe kar û barê xwe. Lewra dibêjin "Sibatê befr û batê, keçik jı gihay hatê". Sibat peyveke suriyaniye.

Reşemê: Dibêjin, jinik li vê mê da derdikevin ber tavê, lewra navçavên wan piçek reştal dibin.

HIN SAXÊN SALNAMA KURDÎ

Ji bo xwendevanên me hin ji lî ser salnama kurdi ronî bibin,
ROJA NÛ ev lista jêrin amedekir.

<p>Adar (1) Nisan Gulan Hezêran Tirmeh Tebax Îlon Çiriya Pêşin Çiriya Paşin Kanûna Pêşin Kanûna Paşin Sibat</p>	<p>Adar (2) Ebrul Gulan Heziran Tammuz Tabax Eylul Çiriya Pêşin Çiriya Paşin Kanuna Evvel Kanuna Sani Sibat</p>	<p>Adar (3) Nisan Gulan Heziran Tirmeh Tebax Îlon Cotmeh Majdar Kanûn Çile Sibat</p>	<p>Avdar-Newroz (4) Nisan-Banemer Gulan-Cozerdan Cezzeran-Pûşber Tirmeh-Xermanan Tibax-Gelawêj Kerqehan-Rezber Çiriya Pêşin-Gelarêzan Çiriya Paşin-Sermawûz Berçulle-Befranbar Çille-Rêbendan Gecok-Reşeme</p>	<p>Noroj (5) Gulan Baranbaran Germacuman Gelawêj Berewpajiz Miran Gelarêzan Agiardan Seholbendan Nawzistan Polan</p>	<p>March April May June July August September Oktober November December January February</p>
---	---	--	--	--	--

1- Kovara HAWAR, 1933-ŞAM

2- 100 Soruda Türk Folkloru, Prof. Pertew Naili Boratav, 1973-İSTANBUL (Ev nivîskarê Tirk li hêla Muşê rasti van navên mehan hatiye)

3- Kovara AZADÎ, 1978-PARIS

4- Salnama Kurdi-KOMA NEWROZÊ, 1983-ŞAM

5- Kurdish-English Dictionary, Taufiq Wahby and C.J. Edmonds, 1971 - LONDON

HEVPEYVINEK

B1

Dr. KEMAL FUAT'va



ROJA NÛ: Kek Kemal tu dikari çend gotinan ser jiyina xwe ji xwendevanên "Roja Nû" ra bêji ?

K. FUAT : Ez 4.9.1932'an li bajarê Suleymaniyê, li Kurdistanê I raqê hatime dinê. Min xwendina xwe heta lîsê li wir ajot, paşê ez ji bo zanîngehê heta bajarê Bexdayê çûm. Di sala 1953'an da ez ha tîm girtin û ez ji zanîngehê avitim. Heya sala 1958'an ez çend çar ran li Suleymaniyê, li Bexdayê di girtîgehê da mam. Ji ber vê yekê min nikaribû xwendina bilind pêşda bibira û ez hatim li derwayî welat û di sala 1957'an da min dest bi xwendina xwe kir.

Di navbera salên 1959-1963'an da min Sekreteriya Komela Xwende karên Kurd girt ser milên xwe, di sala 1963'an da ji bûm serokê Komela Xwendekarên Kurd.

Di sala 1962'an da li Berlina Rojhilat li zanîngeha bi navê Humboldt, di beşê Îranzaniyê da li bal Prof. Junker min diploma xwe pêkani. Piştî sala 1965'an ez çûm Kurdistanê di dema şoreşê.

Min di sala 1965'an da dest bi nivîsandina xebata xwe kir, li ser "Destnîvisarên Kurdî" min ev xebata dokoriyê di sala 1969'an da qedand. Ev xebata zanîstî, bi navê "Kurdische Handschriften", di sala 1970'an da li Elmania Rojava li bajarê Wiesbaden hate çap kirin. Piştî sala 1970'an ez vegerim li Kurdistanê, wek mamosteyê Zanîngeha Bexdayê, piştî mîna li zanîngeha Suleymaniyê seroktiya beşa kurdzaniyê kir, heta ku paşî sala 1974'an dema mamoste û xwendekarên zanîngehê hatin ketin nav şoreşê. Piştî belavbûna şoreşê di sala 1975'an heya niha, ez li Berlina Rojava karên zanîstî dikim. Di sala 1975'an da, ez damezrandina Yekîtiya Nîştîmanê Kurdistan da beşdar bûm.

ROJA NÛ: Heya niha li ser zîman û edebiyata kurdi we çî kar pêkanîne ?

K. FUAT: Dema ez li Ewrûpayê bûm, min rojnema kurdiye yekemîn "Kurdistan" peydakiribû. Ev rojname min di sala 1972'an da li bajarê Bexdayê weşand û da belavkirinê. Di sala wê salê da, romana Îbrahîm Ahmed bi navê "Janên Gel" çap kir. Min gelek gotarên edebî, zîmanzani û siyasî li rojname û kovarên kurdi, erebî, elmanî da dan çapkirinê. Min "Destnîvisarên Kurdî" beşê duwemîn amade kir û di van nêzikaya da bi zîmanê elmanî wê bê weşandin. Di sala 1975'an da min rojname "Kurdistan" (1917-1918) xebatek min wê çap bibe. Ez hêvi dikim ku li ser projeyên edebî, zîmanzani û diroka (mêjû) Kurdistanê, li van salên pêşîya me, hin xebatên min wê bi zîmanê kurdi û zîmanê biyani bêne weşandin.

ROJA NÛ: Kareki çawa di nav zîmanê kurdi da mîrov bîke, weki zîmanê kurdi da yekîtik pêk bê.

K. FUAT: Zîmanê kurdi iro, bi du zaravayên edebî û bi sê cure alfabeyan va tê nivîsandinê. Kurmancî (kurdiya bakur, an ji kurdi

ya rojava) l1 Tirkîyê, l1 Suriyê b1 tipên latîni û l1 Sovyet b1 tipên kirilî va tê nivisandin. Soranî (kurdiya bajur, an jî rojhat) b1 tipên erebî l1 Kurdîstana Îran û Iraq tê nivisandin. Bîr û bawerîya min wîloye ku, herdu zaravên kurdi pêwîste b1 kar bêne, l1 gel hev wan hemberîhevkin, b1 zanîstî, ferhengî û rêzmanî. B1 vî tehîrî ev herdu zarav dikarin nêzîkî hevbin û em behrêkê jê gîrêdin. L1 ser vê pîrsê min dîr-dîrêj nivîsîye ku d1 nav kurdan da zîmanê kurdi, wek hemû zîmanên cihanê ew jî, j1 gelek zaravayan pêk hatiye. Rewşa îro yarmetîyê (alîkarî) nade ku ev herdu zaravayên kurdi b1 yek zaravayê bêne karanîn û l1 hemû Kurdîstanê bê xebitandin.

ROJA NÛ: L1 seranserî Kurdîstanê, d1 nav hemû hêzên welatparêz da tu dan û standîneke çawa pêwîst dîbinî ?

K. FUAT: L1 Kurdîstanê partîyên pêşverû pêwîste d1 nav xwe da dan û standînen xurt pêk binin û komîteyên yekîtiyê amadekin. B1 vî tehîrî ew pêwîstî d1 nav xwe da kordinasyonêkê pêk binin l1 dijî ew dewletên ku Kurdîstan d1 nav xwe da zewtkirîne û l1 dijî hemû hêzên kevneperestên kurdi, biyanî û l1 dijî împeryalîzma cîhanî.

ROJA NÛ: L1 seranserî Iraqê j1 bo hêzên kurdi û ereb hûn karekî çawa pêwîst dîbinin, wekî rejîma Saddam hilweşe ?

K. FUAT: Ew hêzên niştîman, demokrat, pêşverû û sosyalîst pêwîstî l1 dijî rejîma Iraq eniyekê pêkbinin, xebata xwe yek bikin, xurt bikin heta ku rejîma faşîstên Iraq bê hilweşandin. L1 şûna wê pêwîste hukmetê demokrat û serbixwe bê sazîrîn, mafê neteweyê kurdi b1 cih bike, l1 ser bîngêhen komareke (cumhuriyet) federatîf û sosyalîst.

ROJA NÛ: J1 bo "Roja Nû" tîştêkî tu bêjî, heye ?

K. FUAT: J1 bo vê hevpeyvinê zor spasî kovara "Roja Nû" dikim. Heya niha min 2 hejmarên Roja Nû dîtiye, ew kovareke ciwan, rêkûpêk û dilxweşkîre. Ez hêvî dikim ku ev kovara jiyîna xwe bide ajotîn û pêşva here, j1 bo xîzmeta çanda kurdi .

Yek pêşneyara min heye, wekî kovar çend rûpelan terxan bike j1 bo nivisandîna soranî b1 tipên latîni, j1 bo pênasîna zîman û edebiyata kurdi b1 herdu zaravayên kurdi.



DEFÎNA PEYVËN ZIMANÊ KURDÎ

ROHAT

Iro lî rûyê cihanê zımaneki wusan zelal, paqîj, serbıxwe û dın bın bandûra zımanên dın da nemaye, mırov nıkare nişan bide. Navbera hemû zımanên cihanêda peywendî, kontak dan û standınên cure-cure, dı nav gelek salan da hatine pêkanin. Ev pevgırêdanan nav zımanan da realiteke û destê mırovan da nine, weki pêşiya vê yekê bigre, bend bike. Dı hın zımanan da carına hın peyv (gotın, kelime) mırine, lı şuna wan hın tıştên nûh hatine wergirtın û ketına nav turık û defına peyvên wi zımani.

Hemû zımanên cihanê hertım guhurine, pêşta herikine, tıştên nûh tevi xwe kırine, lê jı bınyat û himên xwe tu tışteke zêde wunda nekırine. Lê, hın zıman jı hene, wusan xurt dı bın bandûra zımanê ki dın da mane, bingehên wan hejiyane hêdi-hêdi jı ortê rabûne û bûne zımanên mıri an jı nivmıri.

Angori rewşa du milletan, kontak û peywendiyên navbera zımanên wan da jı, carına pır tûj bûne, zêde bûne an jı carına bı salan kême tesir lı ser hev hiştine. Firebûna kontaktên zımanan bı rasti bı peywendiyên wan gelan va girêdayi mane. Misal, zımanê engilizi pır peyvên bıyani va tıjiye û bı taybeti peyvên jı zımanê frensi tên, dı zımanê engilizi da iro sedı 50 ev peyvın bı hêsani tên dengkırın û kes jı pey van peyvın neketiye, weki jı kiderê hatine, jı ber ku, ew bûne perçeki zımanê engilizi, dı jiyına rojane da tên xebitandin.

Kontak û peywendiyên dı navbera zımanan bı gelek rıyan va hatine pêkanin, misal:

- 1- *Peywendiyên abori, peywendiyên kırin-fırotınê û bazırıganiyê*
- 2- *Pêştaçûyına teknik-zanıstıyan, belavbûna icatên nû, firehbûna warê teknikê dı navbera gelan da.*
- 3- *Belavbûna bir-baweri û ramanên olperesti (dini) û tesira wan lı ser zımanan.*
- 4- *Pêştaçûyına karên politik, dan û standınên politik.*
- 5- *Ceng û şerên dı navbera hın welatan û peywendiyên leşkeri.*
- 6- *Rola nivıskar, ronakbir, pıspor û rewşenbiran dı cıvatekê da efrandın, zıman û belavbûna ramanên wan.*
- 7- *Hın peywendiyên cıvaki (sosiyal) wek jınanin-mêrkırın, cınartı, kırıvti, dostayeti-dıjınayeti.*
- 8- *Rola gerok, rêwi û turıstan.*
- 9- *Dan û standınên navbera welatên cuda, dı warê çand, huner û edebiyatê da, seridan û hevdiına hunervan û sporvanan, lec û cıvatên wan lı cihanê.*
- 10- *Dı dema me da bı lez pêştaçûyına weşanan wek, radiyo, televizyon, kovar, rojneme û hacetên dın lı çar koşên cihanê.*

Bı van hemû riyên jor rêzkırı va, gelek peyv (gotın, kelime) nûh ketine nav zımanên cuda û bûne malê wan zımanan. Dema mırov peyvın van gotınan bıkeve, bingehên wan vekoline, vejine, mırovê bıbine ku, ev peyvına bı alıkarıya van dan û standınan va hatine ketine van zımanan. Misal, dı zımanê tırki da em rasti gelek peyvên bı-

yani hatin û me ew lî jêr rêzkîrîn, weki xwendevanên me dinamizma jiyina zîmanan raçav bîkîn:

Kiraz, barut, lodos, geometri (YUWNANÎ), Mermer, reform, reçete, sabun (LATİNÎ), bira, banka, bravo, prim, lira (ITALYANÎ), loka, marka, roket (ELMANÎ), Maç, gol, park, parola (ENGLIZÎ), avans, kare, karne, ceket, jandarma, polis (FRANSÎ), ambargo, platin, merinos (İSPANÎ), votka, pulluk, çaynik (RÛSÎ), patika, goçuk, dobra-dobra (BULGARÎ), Masa (ROMENÎ), palaska (MACARÎ), kakao (MEKSİKANÎ), tayfun, cûce, çay (ÇİNÎ), kitap, akıl, dakika, edebîyat, cebir, asker (EREBÎ), çeşme, hasta, rüzgar (FARSÎ).

Hemû ev misalên jorin bî devki an jî bî nivîsari dî nav gelek salan da hatinê ketine nav zîmanê tirkî, hejmara wan bes ev lista jorin nine, bî hezaran jî van peyvan iro dî zîmanê tirkî da têr xebitandin. Hebûna van peyvan dî zîmanê tirkî da, tunebûna zîmanê tirkî tu wext nişani me nade. Lê carina hin zaneyên tirkî û kevneperestên şoven lî Tirkîyê hin peyvên biyani dî zîmanê kurdi da nişani gel didin û dibêjin; zîmanekî bî navê kurdi tuneye, jî ber ku zîmanê kurdi bî peyvên biyani va tîjiye, zîmanekî melez û tevliheve. Mêjuşustin û asimilasyona iro lî Kurdîstana Tirkîyê dajo, lî ser van vir-derewan bingeh girtiye.

Zîmanzanên tirkî bî xwe jî, carina bandûra zîmanên biyani lî ser zîmanê tirkî nişan didin û vê yekê wek hejandina bingehên zîmanê tirkî dibînin. Dema, Prof. Doğan Arslan dî pirtûka xwe da lî ser peyva hevîrêdanê "ki" dîsekine, ew dibêje ku, ev peyva dî bingehê zîmanê tirkî da tuneye û jî zîmanê farisî hatiye ketiye zîmanê tirkî, wek "Sen ki bunun doğru olduğunu biliyorsun" (1). Bî taybetî navên tîştên berdest, kêrhati û navên hebûnan bî hêsayi dîkevîne nav zîmanên cuda. Lê peyveke wek "ki" (ne navê)nişana pevgirêdana hevokane, kêr dîkevîne nav zîmanekî dîn. Jî ber vê yekê me ev misala jorin raberi xwendevanan kîr.

Wek hemû zîmanên cihanê, tûrik an defina zîmanê kurdi jî bî 3 rîyan va hatiye pêkanin û avdanê. Çawa filolog didin diyarkîrîn weki iro lî ser 30 hezari peyv dî nav defina zîmanê kurdi da hene. Hemû ev peyvana bî van rîyan va dî zîmanê kurdi da cih girtine.

1- Pîraniya peyvên dî zîmanê kurdi da cih girtine, bingeh, hin û sermeya zîmanê kurdi pêktînin. Ev peyvana çavkaniya zîmanê kurdîne û zîmanê kurdi cara pêşin lî ser bingehên van peyvan destpêkîriye pêşta çûye. Ev peyvana meya, tov û rûnê zîmanê kurdîne. Pîraniya van peyvan, wusan jî bingehên zîmanên gelên Îranêye dîn (farisî, Efganî, Tacîkî) pêk tinên. Ev peyvana zu-zu naguhîrîn, hebûna xwe bî salan didin ajotîn, bingehê wan, natewe, naheşe û lî hemberî asimilasyonê jî tund û xurtîn. Wek hin navên van kategoriyên jêrin;

a) Navên hin hebûnên tebiyetê: Çiya, baran, av, ax, çem, stêrk hîv, roj...

b) Navên pîzîmamti û kesên nêzik: Dê, bav, bîra, keç, kur, pîrîk kalîk, xal, ap, met...

c) Navên hin beşên bedena mirovan: Dest, pê, dev, guh, dîran, çav....

d) Navên hin bûyer û karên bingehîn: Xwarîn, Çûyin, mîrîn, jîyin, zanîn, nasîn, girtîn....

e) Hin navên heywanan: Gur, hesp, hîrç, se, çivîk, mîşk, pişik.

f) Navên Nebat û Hêşnayan: Sêv, hurmê, nar, dar, kulîlk...

g) Navên Tehrên Hebûnan: Gîran, sıvîk, germ, sar, kurt, dirêj.

h) Navên Hejmaran: Yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heyşt, neh deh.....

2- Riya zêdekîrîna peyvên dî hewan, tûrîk û defîna kurdi da çarîna jî bî alîkariya hîn paşpirtîk, pêşpirtîk, hevçîrtîna du navan an jî nav û binyata fêlekê va efrandîna peyvên nûhe.

a) Bî alîkariya Pêşpirtîkan: *Ber-bang, Ser-wext, jêr-zemin, bîn dest.*

b) Bî Alîkariya Paşpirtîkan: *Nêçîr-van, bîn-geh, şoreş-van, huher-mend.*

c) Bî Alîkariya Bîngêhên Fêlan: *Mêr-kuj, deng-bêj, nan-pêş.*

d) Hevçîrtîna Du Navan: *Keç-met, kur-ap.*

Jî der van riyên jorin, hîn riyên dîn jî dî zîmanê kurdi da hene, wekî mirov hîn peyvên nûh bîefrine, çê bîke.

3- Peyvên dî zîmanê kurdi da cih çîrtîne, dema mirov lê dînhêre, jî vana hînek jî zîmanên bîyanî hatîne ketîne zîmanê kurdi. Me riyên vê bûyerê dî despêka nivîsara xwe da lî ser 10 xalan rêz kirîbû. Hemû ev peyvên bîyanî, bî taybetî jî van zîmanên jêrîn hârtîne, wek, zîmanê erebî, tîrkî, rûsî, ermenî û hîn zîmanên wela-tên rojavayê. Peyvên ku jî zîmanên rojavayê ketîne zîmanê kurdi, bî taybetî bî alîkariya zîmanê tîrkî û erebî va dîre-dûr ketîne zîmanê kurdi, wek *peyvên polês, Cendîrme, cekêt, barut, banke....*



Paşî belavbûna olê (dîn) îslamî dî nav gelên rohilata navîn, nêzik û dî nav hîn gelên Efrîkayê, dî sedsalîya 7'an da, wusan jî zîmanê erebî destpêdîke lî ser zîmanên van gelan bandûra xwe nişan dîde. Paşî vê bûyera dîroki gelek peyvên erebî dîkevîne nav zîmanên van gelan û tîn xebîtandin, wek zîmanê tîrkî, farsî, kurdi, Heta niha çawa em lê dînhêrîn, dî zîmanê kurdi da jî gelek peyvên erebî hene, jî vana hînek raste-rast ketîne zîmanê kurdi, hînek jî wan jî bî riya û bî saya zîmanê tîrkî û farisî va hatîne dî zîmanê kurdi da cîvar bûne, wek:

Amin (<i>bawermend</i>)	emel (<i>kar</i>)	Mekteb (<i>dîbîstan</i>)	Xeber (<i>gotîn</i>)
Bimbarek (<i>piroz</i>)	ewlîn (<i>pêşîn</i>)	mexluqet (<i>mîrove</i>)	xerîb (<i>bîyanî</i>)
Edebiyat (<i>bêje</i>)	îman (<i>bawerî</i>)	rîca (<i>tîka</i>)	heq (<i>maf</i>)
Eyan (<i>berbîçav</i>)	lazîm (<i>pêwîst</i>)	fîkîr (<i>raman</i>)	şer (<i>ceng</i>)
Eyb (<i>fedî</i>)	letîf (<i>baş</i>)	ferq (<i>cudatî</i>)	şert (<i>hoy</i>)

Hemû ev misalên jorin, ne tenê zîmanê kurdi, wusan jî ketîne zîmanê tîrkî û hîn zîmanên dîn jî. Çarîna ev gotîn, peyvên erebî dema ketîne nav zîmanekî, van peyvên dî nav hîn zîmana da mene û naveroka xwe guherandîne, mîsal "dewet" dî zîmanê kurdi da, lî cîhê "Dilan" ê tî xebîtandin, dî zîmanê tîrkî da, lî cîhê "Vexwandîn" ê tî xebîtandin. Çawa dî lista jorin de jî xweş tî dîtîne, lî şûna van peyvên erebî, dî zîmanê kurdi da bî kurdi hîn peyvên nûh çîgîrtîne. Ev zelalbûn û paqîjbûn dî zîmanê kurdi da iro jî da-jo.

Gelê kurd çawa tî zanîn jî mêjva, berî bûyîna Îsa lî ser erd-axa Kurdîstanê jîyîne û bînciyên wê hêlêne. Lê paşî sedsalîya 10 an eşîrên tîrkan jî ber hîşkbûna erdê û bêaviyê jî Asîya Navîn rêdîkevin lî berbî Kurdîstanê, Asîya Nêzik dîherîkîn. Dî dawiyê dî ew tîn lî Kurdîstanê zordestiyê lî gelê Kurd dîkîn, xurt dîbîn û axa Kurdîstanê dîxîn bîn destên xwe.

Bî vî tehrî pêşveçûna aborî, cîvakî û çandî lî Kurdîstanê tî seknandin û pêşîya wê tî bendkîrîn. Wusan jî zîmanê tîrkî, jî wan

salan da destpêdike heta niha bandûra xwe lî ser zîmanê kurdi nişandaye û nişan dide. Paşî avakîrîna *Komara Tîrkiyê* (1923) lî Tîrkiyê politikaya asimilasyon û mêjûşuştinê lî ser Kurdan tûjtîr û hişkîr dibe, ev politika bî serwestî tê ajotîn. Jî alîkî da ev zordestiyên politik, jî aliyê dînda peywendiyên navbera herdu gelan da, wek kirin-fîrotîn, jînanîn-mêrkîrîn, yekbûna baweriyên wan dî warê din da û wek peywendiyên dijîmneyetî-dostayetiyê, gelek faktorên din jî lî ser kontaktên navbera tîrki û kurdi da rolîne berbiçav listîne. Gelek peyvên tîrki ketîne nav kurdi, wusan jî hîn peyvên kurdi ketîne nav tîrki. Dî nav kurdi, wek van peyvên jêrin cih girtîne;

Aylîx (<i>aylık</i>)	Geveze (<i>geveze</i>)
Başqe (<i>başka</i>)	Defçî (<i>davulcu</i>)
Bol (<i>bol</i>)	Xîyar (<i>hıyar</i>)
Borî (<i>boru</i>)	Qutî (<i>kutu</i>)

Bî taybetî ev paşpirtîkên tîrki, dî kurdi da hatîne lî paşîya peyvân zelîqîne, wek -çî, -lî, -lîk, -sîz.



Jî ber nêzîkbûna bîngêhên zîmanê kurdi û farisî, çimkî malbata wan yeke, bî bawerîya me, wusan jî pîr peyvên bî kurdi ketîne nav zîmanê tîrki. Jî bo hevderanîna vê pîrsê heta niha lêgerîn û xeba teke berbiçav nehatiye pêkanîn. Lê, çawa filologên Sovyet dema lî ser diroka zîmanê kurdi dîsekinîn, ew dî pêşgotîna ferhenga tîrki-rûsî dibêjin ku; " Dî nav defîna peyvên tîrki da, wusan jî gelek peyvên bî ermenî, kurdi, italyanî û hîn peyvên zîmanên din he ne. Ev yeka, dî sedsaliya navîn da, dema despêkîrîna peywendiyên tîrkan bî van gelan va hatiye pêkanîn!"(2)

Dî zîmanê tîrki da iro gelek peyvên bî zîmanên Îranî(kurdi, farisî, belucanî, tacîkî) hene. Em listeke van peyvân lî jêr raberî xwendevanên dîkîn. Xwendevanên dîkarîna bî saya vê listê va bîbinîn, wekî zîmanên cuda-cuda çawa lî ser hev bandûrekê nişan dîdîn. Jî aliyê din, ew dîkarîna zîmanê kurdi û van peyvân hemberî hev bîkîn cihê hîn peyvên kurdi dî zîmanê tîrki da bîbinîn. Disa xwendevanên dîkarîna nêzîkbûna malbata zîmanên Îranî xweş dî vê listê da bînin ber çavên xwe.

Abonoz	Aşîkar	Bahçe	Berhudar	Camekan	Çare
Aferîn	Aşîna	Bahş	Beste	Can	Çark
Afsun	Ateş	Bahşiş	Beter	Canane	Çarmîh
Afyon	Avare	Baht	Beygir	Candar	Çarşaf
Agah	Avaz	Bahtiyar	Beyhude	Cendere	Çarşamba
Aheng	Avize	Bari	Bezîrgan	Cengaver	Çarşî
Aheste	Avlak	Bazu	Biber	Çenk	Çehre
Ahu	Ayna	Beyayîş	Biçare	Civa	Çengel
Amaç	Azar	Bedava	Bigane	Ciger	Çerçeve
Amade	Baç	Bedbaht	Bila	Cihan	Çeşme
Ant	Bade	Bedbin	Bostan	Cihangîr	Çeşnî
Apdest	Badem	Beher	Bûlbûl	Civan	Çeyrek
Armağan	Bağ	Behre	Bûlend	Civanmerd	Çift
Armut	Baha	Bender		Cömerd	Çifte
Arzu	Bahadır	Beraber	Cadı	Cihud	Çile
Asayîş	Bahane	Berbat	Cam	Cümbüş	Çini
Asude	Bahar	Berheva	Cambaz	Çardak	Çirkef

Çoban	Gümrah	Köfte	Pencere	Sermaye	Zira
Çünkü	Günah	Köse	Pençe	Sersem	Ziyan
Dad	Günahkar	Köşe	Perçem	Serseri	Zor
Dağ	Güya	Köşebend	Perde	Sert	Zorba
Dama	Güzergeh	Küstah	Pergel	Seyran	Zurna (3)
Dana	Güzin	Lades	Peri	Seyrangah	
Derbeder	Hafta	Lale	Perişan	Sine	
Derbent	Hakan	Legen	Perşembe	Sitem	
Dergah	Hal	Leke	Perva	Softa	
Derhal	Ham	Madrabaz	Peşin	Şad	
Derman	Han	Maya	Peşinen	Şadırvan	
Dert	Hane	Meğer		Şaheser	
Derviş	Hanedan	Mehtab	Peşkes	Şahin	
Derya	Harman	Menekşe	Peştimal	Şal	
Destan	Hasta	Merdiven	Peygamber	Şalgam	
Deste	Hastane	Merdane	Peyda	Şamdam	
Destek	Hayli	Mert	Peyderpey	Şano	
Destere	Hem	Mest	Peyk	Şarap	
Dev	Henüz	Meyve	Peynir	Şayan	
Diger	Hemen	Meze	Pezevenk	Şayet	
Dilaver	Hempa	Miheng	Pilav	Şehir	
Dilber	Her	Mum	Pir	Şeker	
Divan	Hergele	Murdar	Pirinç	Şirin	
Divane	Herkes	Muşta	Pişdar	Şive	
Dost	Heveng	Müjde	Pişman		
Dostane	Hiç	Naçar	Piyade	Taç	
Dubara	Hoca	Nam	Post	Taht	
Dudu	Hodırı	Namaz	Pul	Tahta	
Duvar	Hor	Namazet	Puşu	Tane	
Dürbün	Horoz	Namzet		Tarçın	
Dürüst	Hoş	Nankör	Rast	Tazı	
Düşman	Hoşav	Nar	Rehber	Tenha	
Eger	Hurda	Naz	Rencide	Testere	
Ejderha	Hurma	Nazik	Rençber	Testi	
Ejderha	Hurma	Nazikane	Rende	Tez	
Encümen	Hüner	Nem	Rengarenk	Tezgaç	
Endam	Kafes	Ney	Rengin	Turşu	
Endişe	Kağıt	Nezd	Reng	Umit	
Erişte	Kar	Nigar	Reva		
Ezber	Kelepçe	Nilüfer	Revan	Yaban	
Fer	Kelle	Nişan	Rıhtım	Yabani	
Ferah	Kem	Nişangah	Rüzgar	Yad	
Ferda	Kemençe	Niyaz		Yadigar	
Feriste	Keman	Nohut	Sade	Yar	
Ferman	Kemer	Nümayiş	Sahte	Yegane	
Feryat	Kenar	Papuç	Sarhoş	Yekpare	
Fıstık	Kepaze	Paşa	Saye	Yezdan	
Figana	Kereste	Pak	Saz		
Fürüzan	Kervan	Panzehir	Sehpa	Zehir	
Gavur	Kervansaray	Para	Sepet	Zemberek	
Gerdan	Kese	Pare	Serap	Zemin	
Gerdek	Keşiş	Pars	Serbest	Zenne	
Girdap	Keşke	Pazar	Serdar	Zer	
Gırift	Ki	Pehlivan	Sergüzeşt	Zerdali	
Gül	Köhne	Pehriz	Serhat	Zil	
			Serkeş	Zincir	

Dema zımanzan û kurdzanê hêja, Prof. Çerkez Bakaev, Zımanê Kurdi bî zımanê erebi, tırki, rûsi û ermeni va tine pêşberî hev, dema ew bandûra wan lî ser zımanê kurdi nişan dide, ew despêka xebata xwe da dide diyar kîrîn, weki bandûra zımanê farîsi lî ser zımanê kurdi û şîrovekirîna vê yekê pîr dijwar û çetîne. Jî ber ku, bîngêh û malbata van herdu zımanan jî yeke. (4)

Jî ber nêzîkbûna sinorên Kurdîstanê û Ûrîsetê berî gelek salan hîn peyvên rûsi jî ketîne nav zımanê kurdi û bî taybetî lî hêlên Qersê, Qerkîlisê, Mûş û Wanê dî nav gel da car-carîna tîen dengkîrîn. Hîne peywendiyên kîrîn-fîrotîne, peywendiyên cinartiyê û jî ber ku, Kurdîstan hertîm meydana ceng û şeran bû, dî nav Osmanîyan û Ûrîsetê da. Jî ber van hemû sedemên jorîn tîkîlî, peywendî û kontaktên zımanê rûsi û kurdi, jî mêjva hene. Wek van peyvên jêrîn, hîn peyvên din jî lî nav navçeyên jorgotî tîen xebitandin, mîsal;

Abrigoz: Zerdeli	Matoşke: Dê	Padval: Jêrzemin
Şkaf: Dolav	Spîşke: Heste	Patnos: Sîni
Stol: Kursi	Îstekan: Kase	Katlêt: Kevab
Kanfêt: Şekîr	Zakon: Qanun	Knîşke: Pîrtûk
Tarêlk: Tas	Piyan: Serxoş	Pût: 16,3 Kilo

Dî zımanê kurdi da, wek tût (dareke fêkiyan) lewaş (naneki pen) û axçîk (Navê keçan) çend peyvên bî zımanê ermeni jî carîna tîen xebitandin.

B I K U T A S Î

- Kontak, peywendî, dan û standîne dî navbera zımanên cuda-cuda bûyereke normale, pêwîste mîrov jî ber vê yekê dilêş nebe, lî hemberî hîn zımanên gelên bîyanî dijayetikê nejo, pêwîste mîrov lî ser vê pîrsê bînfîreh bibe.

- Paqîjkîrîna zımanê kurdi jî hîn peyvên bîyanî û zelalkîrîna zımanê kurdi bî destê zımanzan, pîspor û pêşekarên zımanê kurdi da pêwîste bê ajotîn. Leyîstîna herkesî bî zımanê kurdi va nebaşê, herkes tîştêkî jî ber xwe derxe, ev yeka dîkare bîngêhên zımanê kurdi bîhejîne, serêşiyên nûh peyda bike û rîya dan û standîne lî gel mîrovan qels bike.

- Lî hemberî kevneperest, şoven û dijîmînen gel, bî taybetî lî Tîrkiyê lî dijî baweriyên çewt, pûç û xelet pêwîste herkesê welat parêz, raweste. Jî ber ku hêzên kolonyalist tunebûna zımanê kurdi hertîm derpêş û propağanda dîkîn.

ÇAVKANİYÊN KÊRHATÎ

(1) Her yönüyle Dil-Ana Çizgileriyle Dilbilim, Prof. Doğan Aslan 1979-Ankara, Türk Dil Kurumu Yayınları, Rûpel.139

(2) Türkçe-Rusça Sözlük (48.000 kelime), Şark İlimleri Akademisi, Şarkiyat Enstitüsü, 1977 Moskova.

(3) Türkçe - Rusça Sözlük

(4) Rola Yazıkoviç Kontaktov v Razviti Yazıka Kurdov SSSP (Rola Peywendiyên Zımanan, dî Warê Pêşketîna Zımanê Kurdên Sovyet) Ç.X. Bakaev, 1977 - Moskova.

mamosteyê folklorê kurdi

prof. HECIYÊ CINDI



J1 ber tijikîrîna 75 saliya wi, Roja Nû b1 pîspor û şarezayê folklor û filologiyê Prof. HECIYÊ CINDÎ'va hevpeyvînek amadekir. Hevpeyvîn l1 ser daxwaza kovara Roja Nû, b1 destê nivîskar Tosîne Reşîd hatiye pêkanîn. D1 75 saliya xwe da, kovara Roja Nû j1 Prof. Heciyê Cindi ra salîne dirêj û genc hêvi dîke, j1 ber kar û keda wiye hêja, Roja Nû wi b1 dilgermi pîroz dîke.

.....

PIRS: Xwendevanê kurd j1 zûva nav û dengê we bihistîne, b1 kema xwe hûn dîkarin gelo çend gotîna l1 ser jiyîna xwe bêjin ?

BERSÎV: Ez d1 sala 1908'an da l1 gundê Emençayirê, weki dîkeve nava parwelatê bajarê Qersê (l1 Kurdistanê Tirkîyê) j1 diya xwe bûme. Çawa çil malên gundê me, wusan ji dê û bavê min cotkaridîkî rîn, pez-dewar xweyî dikîrîn.

D1 sala 1918'an da leşkerê Tirkîyê, weki em wusan ji jêra d1-bêjin "Leşkerê Romê" ew parwelata ji zevt kîrîn. Ez û êzdiyên vi bajari (16 gund) tevî Ermeniyên cînar cişîhîti kîrîn. Leşkerê Romê cimeta me qîrkîr, ez mam sêwi.

J1 sala 1919 heta 1929'an ez l1 sêwixana ermenîyan mam û l1 wê sêwixanê ji ez hîni zîmanê ermenî bûm. Min xwendîna xwe ya navîn l1 wîr xelas kîr. J1 sala 1930'an heta niha ez l1 bajarê Eriwanê (Rewan) dimînim. J1 wê salê da ji destêkî ez teknikama kurdaye Pîşkavkazê da, d1 redaksiyona rojname "Riya Teze" da û Instutîya Edebiyatê ya Akademiya Ermenîstanêye Zanîstîyan da xebitî. Min ji wê çaxê heta sala 1966'an serwêrî (pêşengî) l1 beşa Yekîtî ya Nivîskarên Kurd l1 Sovyet kîriye. Niha ez l1 Instutîya Rohilat-zaniyê ya Akademiya Ermenîstanêye Zanîstîyan da dîxebitîm.

PIRS: We çend pirtûkên dersan j1 bona zarokên kurd nivîsîne, l1 ser wan hûn ç1 dîkarin bêjin ?

BERSÎV: Min j1 sala 1932'an heta niha gelek pirtûkên dersên z1 manê kurdi amadekirîne. Awa dîkarîm navê çend heban (l1va) bir b1 nîm; Ala Sor (1932), Jiyîna Nûh (1932), Cihana Nûh (1932), Kolkoz vanê Derbdar-Elifba (1933), Pirtûka Zîmine Dersan (1935), Elifba û Bîngêhên Xwendîna (1937), Pirtûka Zîmine Dersan (1937), Elifba (1946), Zîmanê Dê û Hinekên Mayîn....

PIRS: Hûn d1 gelek salên jiyîna xwe da l1 ser berevkîrîna, lêgerîna û çapkirîna folklorê kurdi xebitîne û pêva mijûl bûne. D1 van rojên me da gava folklorê roj b1 roj wunda dibe, bona parastîna wê dewlemendiya gelê kurd pêwîste ç1 bê kîrîn ?

BERSÎV: B1 rastî ji ez gelek salan d1 warê bernivîsar û lêgerîna zargotîna (folklor) me da xebitîme. Zargotîna me, bawer biki pîr rengin û bere. Hemû cimeta me b1 gelek salan ser vê definê bê hed û hesab xebitîye, hîn ji dewlementîr kîriye û gîhandîye van

rojên îroyin. Gelê kurd, dî nav folklorê xwe da, gelek xem-xeyal, Şahi-perişani û azadixweziya xwe ciwarkiriye. Wan ev define dewlemend kîrîna û gelek tîşt jê hinbûne. Zargotîna me jî vir şûnda jî pêwîste bê berevkîrîn, bernivîsarê û çapkîrîne. Dî zemanê me da nîmûnên zargotîna me hîn jî hêsa dîkarîna bîne berevkîrîn, jî ber ku niha teknik pîr pêşta çûye. Ew çiqas bîne bernivîsar, ewqas başe.

Dî warê folklorê da mîna gelek pîrtûk çapkîrîne, jî wana çend hebên sereke evîna; Folklorê Kurmancî (tevi Eminê Evdal) 1936, Ker û Kulukê Sîlêmanê Sîlvî 1941, Şaxên Eposa Koroxlî 1953, Memê û Zîne 1956, Çar Cîldên Çîrokên Kurdan 1961, 1962, 1969, 1980, Kîlâmên Cîmeta Kurdaye Evintiyê 1979, Şaxên Eposa Rostemê Zal 1977.



Her 5 keçên Heciyê Cîndî û jîna wî Zeyne'ya Îbo

PIRS: Niha hûn ser çî dixebitîn ?

BERSÎV: Niha berevoka minê Mesele û Metelokên Cîmeta Kurda çap dibe. Cîlda çîrokên cemata Kurdaye 5'an, pêra jî ferhenga Kurdi-ermenî amade dikim. Bî ditîna min 30 hezar peyva zedêtir peyvên dî ferhengê da cih bigrîn.

PIRS: Çî daxwazên we hene lî ser rojname û kovarên bî kurdi çap dibî ?

BERSÎV: Rojname û kovarên kurdi, jî bo bîghêjîna navekî qenc û serfiraziyên mezîna, pêwîste bî taybetî lî ser rewşa gelê meyi azadixwaz, mîrxas û dorsûrkîrî da, lî ser eded-kevneşopî, rabûn-ru-nîştîna, zargotîna, edebiyat û şarîstaniya gelê me bîsekinîna. Wusan jî, ew pêwîste guh bîdîna pêşketîna kurdên Sovyet, werger û pîrsên cihanêye hewcedar. Evîna, daxwaz û gotînen min.

Biraninek L1 Ser Gora **AHMEDÊ XANÊ**

Bilîndaya çiyayê Gırîdaxê pêncezar sed û şêst û pênce. D1 gund û zozanên wi çiyayî da b1 hezaran meriv, d1 kon, qul û ber zînarên wi da b1 heywanên cûre-cûre û bê jîmar dijîn... Ber lîngê çiyayê Gırîdaxê da deşte dîrêj dibe. D1 vê deştê da cotkar zevîyan cot dîkîn, pale mêrgan dîçînin, gavan û şivan jî b1 dengê meşk û bîlûrên xwe va pêz û dewaran dîçêrinin.. Pêşberî çiyayê Gırîdaxê, l1 ser tapekî, warekî pîr kevn heye. Ew der, 2000 sal berî bûyîna Îsa pêxember, warê Ûrartûya bûye. Wan l1 wîr birceke nêzîkî 300 m dîrêjayî avakîrîne. D1 sedsala 17. da mirê Kurda yê wê hêlê Îsaq paşa b1 navê Kela -Beyazît kelake pîr mezîn û bedew daye avakîrî-nê. Gelek diwarên wê kelayê b1 helbestên Ehmedê Xanê va hatîne qîşandinê...

Wexta ez l1 gund û bajarên wê hêlê dîgeriyam, tîştê ku berê ba la mîn kîşand ew bû, wekî hemû Kurda b1 serê Ehmedê Xanê sond dî-xwarîn. Her wusan jî helbestên wi d1 niveke dîle Kurdên wê hêlê da cî girtîne. Mîn derheqa Xanî da jî kê pîrs dîkîr, bersîva xwe b1 çend rêz helbestên wi va dîda. Weke:

*"Ger dê hebiya me it-tifaqet
Vêk ra bîkîra me inqiyadek"*

An jî : *"Çî bîkîm ku qewî kesade bazar
Nine jî qîmaş ra xerîdar"*

Jî Kela-Beyazît berbî dîbîstana Ehmedê Xanî çûm. Wexta ez gî-hîştîm wîr, melak ber derê dîbîstanê ser kulavekî rûnîştî bû. Me nasiya xwe da hev. Mela ez l1 çavîyên dîbîstanê gerandîm. Tîrba Xanê û rex jî ya kulfeta wî Hebîbe Xanîmê ber dîbîstanê da bû. L1 ser diwaran gelek nivîs hebûn... Mîn b1 pêçîya xwe nivîsek nişan kîr û got:

- Ezbenî, b1 kerema xwe, l1 wîr çî dînivîse ?



- Ew rêzeke Xanêye, tê da gotiye:

*"Mehda esera xeyrê nedihat ji destê Ehmed
Tewfik nedaye wi ew padişahê emced"*

- Mena wê gotina Xanê çiya, melayê mîn ?

- Ehmed efendi tîm kar kiriye û xwastiye, ku kurd hişyar bîbin û bighên serfiraziyê. Lema dî wan rêzan da dilê xwe kiriye, ku li wi neqewîmiye, kar û eserên hîn baştir û hêjatir pêk bine. Û weki xwedê ji zêdetir destûr nedaye wi. Lê, bî baweriya mîn ew karên, ku Ehmed efendi ji bo me Kurda pêkaniye, zaf tiştên hêja û mina defî nekênin....

Wexta mela wusan şirove dîkir, bina mîn fire dibû û derdiketîm seyranê. Mîn hewas dîkir, ku ew şev-roj bipeyive û ez ji bextewar û bî dilcan guhdariya wi bikim....

Mîn çavên xwe dorder digrand û digot:

- Melayê mîn!...

- Belê...

- Bî rasti naxwazim serê te zêde biêşinim ezbeni, lê ku vê nîvisara han ji bixwini, ezê pîr kêfxwaşbim.



- Dî wan rêzan da ji seyda gotiye :

*"Gulbanek ji xeybê hat ev renga tarix
Mehbûd enayet kîr ji bo ev mehbet"*

- Mena wê çiya ?

- Ehmed efendi hunera xwe mîna gulbanekê hesîbandiye û weki xwedê ji ew gulbana delal parastiye... Meriv bî wan gotinana dî-kare bostaneki gula bine ber çavên xwe. Em bêjin, ku dî diroka wi bostani da gelek gul, sosin û kulilkên bedew hêşin bûne. Rojekê ji dî wi bostani da gulbaneke bilind û delal bejin dîde û dîde xemla wi bostani... Ew gulban Ehmed efendiyê Xaniye...

- Raste melayê mîn, pîr sipas....

Gelek meriv dihatin û diçûn. Qasekê şûnda rabûn ser xwe û çûm ber çavkaniyê. Li ser kevirê wê dinivîsi "Kaniya Xani". Ava kaniyê pîr sar bû, agirê kezewa minî şewiti vedimîrand....

Ew ava ku ji çavkaniya Ehmedê Xani dîzê, aveke pîr zelale. Dibe çemeki dîr-dîrêj dîkişe, çiya û baniyan diqelêşe û diçe diğhêje nav behra dinyayê....

M. ARARAT



Şina dengbêjê nav û deng Viktor Xara

Disa ŞİLİ Disa ŞİLİ

Pır dıhat guhê me, hın kesên dılsar bêdengiya Şiliyê dıdan lı rûye me, dıgotın "Pinochet êdi zû-zû jı text nayê dŭrxıstın, faşiz mê hın pır bajo". Sala çûyi jı dı şeveke da keç û xortên kurd strana gelê Şiliyê, strana bı nav û deng VENSEREMOS dıstıran wan dıgot "Lı Şiliyê iro gel bı ser dıkeve", wê şevê naseki mın dı guhê mın da got: "Ev strana pır xweşe, lê ya rast iro lı Şiliyê gel sernakeve".

Hın salekê beri vê, lı gelek cihan karkeran 140 cari kar berdān, nexebitin, dı dawiya sala 1982'an 2 hezar karker 200 metro nêziki Qesra Pinochet cıvınek pêkanin û wan dıgot "Mafên mırovi nede bin piyan, ka nan, ka azadi."

Deh sala berê, neyarên hukmeta Sosyalist lı der û lı hundır, zendên xwe pêçan û planên bı kırêt lı dıji Şiliyê ajotın. Ev planan bı rastı bı destê Emerikayê hatın ajotın. Dı sala 1978'an da keriki ordiyê lı dıji sazûmana Salvador Allende rabûn ser piyan, lê belê ev serhıldana faşist bı destê serokê Qurmeyê Gışti, general Carlos Prats da hat seknandın. CIA'yê êdi destê xwe dırêji Şiliyê kırıbû. Emerikayê dıxwast rojekê pêşta, jı Salvador û jı sazûmana xelas bıbe. CIA û şirketa Telefon-Telgrama navnetewi û hemû komên kevneperest gihiştıbûn hev. Jı van planan yek bı destê Partiya Xıristyanên Demokrat da dıhate ajotın, serok. Eduardo Frei dıgot: "Ordi pêwıste pêşiyê Salvador Allende jı nav rake, maderê paqıj bıke û pıştra pêwıste ew cihê xwe jı me ra bıhêle". Angori vê planê kesên xwedi pêşe (meslek) û xwedanên kamyonan dev jı kar berdān. Wan dıxwast navbera kongrê û hukmetê vebe, navbera wan da dubendi pêk bēn. Xwedanê plana duwemin Partiya Nıştımanı (faşist) û Tevgera Nıştımanı û Azadiyê bû. Wan kêfa xwe bı planên Xıristıyan Demokratān nedıhanin. Wan dıxwast bı xwe bêne ser text.

Emerikayê paşê ani ev herdu ali ji bî hevanin. Êdi Emerika tê-gihîştibû weki tenê bî destê ordiya Şiliyê dikare hukmeta Salvador Allende hilweşîne. Serokê Qurmeyê Gîştî general Prats ji dest jî piştgirtiya Allenda berda. Faşistan zef zor dabûne wi,wi ber-xwe neda. Dî nav wan rojan da karberdana, buhayî, enflasyonê seri hîldabû bilind dibûn. Xwedanên kamyonan dest jî kar berdabûn, tiş-tên xwarin-vexwarinê hatin veşartin, enflasyon sedi 400 bilind bî bû. Lê belê disa ji pîraniya gelê Şiliyê alikariya sazûmana Salvador Allende dikir. Karker û gundiyan baweriya xwe geleki bî wê hukmetê anibû.

Kêmasiyên hukmeta Sosyalist ma tunebûn? Hebûn bêguman. Kêmasiya here mezin, ev bû weki sosyalistan digotin: "Bê diktatoriya proleteryê bî burjuvan va emê tev bixebitin, emê bî burjuvan va hukmetê parevekin". Dî kongra Şiliyê da gelek parlementerên xiristiyân û partiyên din hebûn. Dema zagonek di hate parlementoyê parlementerên milê rast tengasiyên mezin derdixistin. Kêmasike din jî hebû, weki hukmetê dî nav ordiyê da tu paqijik nekir û tîvdarekê xwe neditin. Bendên ordiyê êdi ketibûne destên CIA'yê.

Dî roja 11 Îlonê sala 1973'an da CIA'yê ordi ajote ser hukmeta Allende û hilweşand. Allende dî Qesra seroktiyê da bî mîrxasi ber xwe da, dî dawiyê da hate kuştin. Êdi jî bo gelê Şiliyê rojên teng û tari destpêkiribûn. Xulam û berdestiyê Emerikê general Pinochet hat lî ser text rûnişt, CIA'yê kula dilê xwe derkiribû. Hemû dijminên hukmeta sosyalist diroka 11 Îlonê sala 1973'an da destên xwe hinnekirin. Bî rasti jî hukmeta sosyalist serê wan pîr eşandi bû. Van sekbavan lî Şiliyê riya sosyalizmê lî ber gelê Şiliyê girtin, lî kuçan da xwin êdidiheriki. Bî deh hezaran mirov di stadyumeke mezin da xeniqandin. Dî nav van anti-faşistan da helbestvan û dengbêjê Şiliyê bî şan û şîret VÍKTOR XARA jî hebû. Ew hertim bî gitara xwe va lî diji faşistan diqiriya û dikali :

*Em pênc hezaran
Lî vîr dî vi perçê bajêr da
Em pênc hezaran
Lê bî tevayî em çiqasın
Lî bajarın
Lî seranserî welêt
Tenê lî vîr deh hezar destın
Destên zevî dîçandın û kargeh dîgerandın
.....
.....*

Piştra faşistan ev hezaran gişt bî hevra kuştin, Victor Xara jî tevi wan bû, hat kuştin, gitara wi şikandin û destê wi dan ber gullan, tiliyên wi hûr-hûrî kirin.

Lî Emerika Latin êdi ewreki reş dagirtibû ser axa Şiliyê. Lî serê çiyayên Anda mij û duman bû û hêrs-rîka mirovan tûjtir dikir. Diktatoriya Pinochet guhê xwe da ber devê peyayên Emerikê û lî angori şîretên Milton Fridman dest avite aboriyê. Dî demeke kurt da abori nexwaş û qels kirin. Dî nav van 10 salan da betali, buhayî, enflasyon, birçibûn dî diroka Şiliyê da, dî nav 50 salî da gihîşte dereceke here bilind.

Lî Şiliyê 11 Milyon mirov dijin, jî van 11 milyon 20 hezar kes hate kuştin, bî deh hezaran wunda bûn, nêzkaya milyonek kes jî welatê xwe terikand, çû der. Îro sedi 30 kes betale, jî hersê kesan yek bêkare, birçibûnê destpêkiriye, bûye xela, lî kûçeyên

Santiagoyê bona kode nan gelek mîrov parsê dîkîn. Deynê Şiliyê gi hiştiye 17.5 milyar dolaran. Dema Allende, jî hebûna hatina netewî xebatkaran % 60 par dîgirtin, iro ev hejmara daketiye % 40 'i. Buhayî her diçe bilind dibe û mafên karkeran jî her wusan kurt dibin.

Jî sala 1978'an vîrda, lî dîji Cuntaya faşist tekoşin û xebateke pîr mezin bî destê şoreşvanên Şiliyê berdewam dîke. Lê belê sa la isal ev tekoşina hîn jî xurt bû û bî çalaki ajot. Hemû hêzên çep lî dîji Pinochet bî mîrxasi şer dîkîn. Hîn hêzên mlîê rast jî dîji Pinochet derdîkevin. Dî lî Gulanê da lî Santiagoyê û lî baja rên dîn protestoyên xurt pêk hatin. Navê wê rojê danin "Roja Protestoya Netewî". Lî Şiliyê % 70 karker tevi vê protestoyê bûn. Dî vê rojê da pîr kes birindar bûn û du xort jî hatin kuştin. Jî aliyê dîn gelek kes hatin girtin. Pinochet disa wek berê got, weki dî nav vî kari da "Pêçiya Sovyet" heyê.

Niha Şiliyê jî bo azadi û demokrasiyê xebateke pîr xurt dajo. Rojên Pinochet bî hejmarin. Dûr-nêzik gelê Şiliyê wê rîzgar bibe. Vê baweriyê helbestvanê nav û deng bî xweş tine zar :

*Zordari, êş, mîrîn, ev carekê
reşiyaye bî tov-toxîm.
Mina mîriyan xuya bibe jî xela
Çî roj dibe, vedigere meha îlonê
Bahara xwe hambêz dîke erd
Destên bî hêrs dîqelêşin ewrên gîran
Jî nav mîrîné da, kesk dibe jîyan.*

NECO



helbestek û rexnek

HEYDERÊ OMER (LİBYA)

"Çima Ez Dinim" dî bîn vê navnişanê da bîrader "Zora Mettîni" helbestek nivisandîye. Ev helbest, dî kovara "Dengê Yekitiyê" hej mara yekemin û dî rûpelê 33'an da hatiye weşandin. Dî vê nivisara xwe da, ez dixwazim lî ser vî helbestê bisekinim, çend baweriyên xwe bêjim.

Pêwîste em bawer bikin ku du rûyên jiyînê hene. Yek jî vana rû ye aborî û yek jî rûyê cîvakiye. Bandûra van herdu rûyan lî ser hev giran û germine. Jî ber ku huner (tore) rengeke jî rengên dan û standinê dî navbera gel da. Em dîkarin bêjin weki, ew hevbandûra herdu rûyan civatê, aborî-cîvaki dibe dayika huner, ango huner berbanga jiyînêye. Bî vî tehri em nîkarin bî misal jiyîna lî Kurdistanê û hebûna huner jî hev bîdî veqetandin.

Em hemû dîzanin weki rewşa Kurdistanê, dî bîn van herdu rûyên jiyînê da çawa xuya dibe. Yek jî vana kedxwari, bîndesti, zordari belengazî û bî destê kolonyalîstan pîr hovitiyên mezin, jiyîneke tîrş-tal... Jî aliyê dînan lî hemberî van dîjwariyan hîşyarbûneke politîk (netewî-sosyalîst) bî germî û bî fîretî serê xwe hîldaye. Gavên Kurdistanê tînan avitî, dîdînan zanînan ku, serketîna gelê kurd roj bî roj nêzik dibe.

Bî kurtî rewşa îro lî Kurdistanê em dîbin, eve.

Ger em bîzvîrin helbestê bîrader "Mettîni" em dîbin lî despêkê da, ew dîbêje "EZ" ev despêka başe, dî hunerê politîk û nûjen da, carekê hatiye zanînan, ku dema hunerînan "EZ" dîpeviye, ew xwe dixê cihê gel. Ango "EZ" lî cihê "Em" hatiye xebitandin.

Nîha em dîkarin hîneki lî ser zîman û peyva "Din" bisekinînan, dema helbestvanê me ev peyva jî xwe dînan avit, em geleki dîlşa bûn, lê mîxabin kêfxweşîya me, ewqas dîrêj ne ajot, dî perçê duwemin da ew dîbêje ;

"Ez dinim, lê dinê welêtîm
Ez dinim, lê tev agir û pêtîm"

Çawa mîrovê "Din" dîkare bîzanîbe "Welat" çîye?.. Ma carîna ke seki navên mîrovên "Din" dî rûpelên dîroka gelan da dîtîne. Eger helbestvaneki me, jî ber hezkîrîna gelê xwe, dînan bibe, dîsa em vê yekê rast nabînan, jî ber ku kesên tekoşer, xebatkar û şoreşger "dînan" nabînan, lî ber çavên wan reşbûn xuya nake. Helbestvanê me dî bêje ;

"Reşbûn lî ber çavên min xuyaye"

"Dînbûnê" û "Reşbûnê" gelek sînorên kûr û fîreh xîstîye navbera wî û zanîna rêke rast. Hêviya dî çavên zarokên kurd da dîkene nexuyaye, bawerîya dî dilê gel û pêşmergan da bîlînd dibe nexuyaye, tenê reşbûn xuyaye, ev nêrineke reş û bêhêviye...

Me ev gotînan jî mîjîyê xwe dernexîstîye, herkes hêdi-hêdi bî "Çima Ez Dinim" va mîjûl bibe, wê bîghêje rastîkê. Belavkîrînan û weşandîna giyanekî (ruh) sîst dî navbera gelê me da, tenê kuştîna hêviya gelê me, tenê temîrandîna baweriyên gele, tenê kolandîna gora Kurdistanêye.

Pêwiste hunervan, helbestvan û nivîskar tiliyên xwe bîdîn li ser cihên şaş, xelat û nexwaş di rewşa gel da, divê wan cihên nexwaş bi rengeki rast raxin li pêşiya gel, ji bo gel şiyar bibe û rastiye fêr bibe. Ne tenê ji gel ra bêjin;

*"Fişeka me giha sinorê xewê
Cenga me bû ji bajarê Çirokan"*

Eger perçebûna tevgera Kurdistanê "Mettîni" gihandiye van baweriyên, nêrinên tari û giyanê bê hêvi, disa ji, aliyên rêzani, di-roki û idolojîyê da, em nêrinên wi cida nabinin, ew ne rastin. Ji ber ku perçebûna tevgera wek li Kurdistanê tu caran nabe sedemên van baweriyên reş û tari. Ji aliyê din "Mettîni" dibêje;


*"Felek çiroka dinbûna min bibe ser ba,
Û li cihanê gîştî bigerine"*

Ev yeka, çawa xweş tê zanin "Felek" tu caran barê gelan hilna-de ser milên xwe. Axa Kurdistanê bi xwinê, va tê avdan, çawa em vegerin li sedsalên navin û bêjin "Felek çiroka me li cihanê bigerine".

Hunervanên me, wek Hemedani, Ahmedê Xanê, Feqiyê Teyran, heta Goran, Cigerxwin, Osman Sebrî û gelek kêsên din, bi rûmeti cihê xwe di nav gelê kurd û hunerên gelên biyani da dagirtine. Pêwiste xwendevan û hunervanên nûn serbilindiya huner, edebiyata me bîparêzî û baş bîzanbîn ku cihê huner di jiyana gelan da çiyê? Carekê nivîskarê Mîsîrê "Ûsîf İdrîs" destûra çûyina Emerîkê ji balyozxana Emerîkê dîxwaze, lê deh roj dibuhîrin, ew tu bersivê nagire. Paşê nivîskar, diçe balyozxana Emerîkê û dipirse "Çima hûn destûra min, nadin, tevi ku kesên "Komînist" di rojekê da desturê digrin". Nivîskar bi xwe ji komînistê. Berpîrsiyarên balyozxanê bersiva wi didin, dibêjin "Nivîskar û hunervan, ne wek kesên politîkî". Ez bawer dikim weki, xwendevanên me, ji vê bersivê wê pir tiştan werbigrin. Çawa Napalyon digot: "Ez ji hezar tangî û ji hezar leşkerî natîrsim, lê gotareke rojnamekê min ditîrsine".




DÎWAR



Paşi serfiraziya filma Rê (Yol) vê carê Yılmaz Güney filmeki bî navê "Diwar" kışand. Filma Diwar lî Frensê di dêreke (klîse) kevn da hatiye kışandin. Zordestiyên lî ser girtiyên tirk û kurd bî destê faşistan, çawa lî Tirkîyê bî hoviti dajon, ev yek a bûye babeta film. Listikvanên film ev kesin: Tuncel Kurtiz, Ayşe Emel Meşci, Nicolas Hossein û İsabella Tissandierin.

Di nav van rojan da film lî Ewrûpayê despêkır bilize.



Serê vê salê lî bajarê Amsterdamê ez kurxatîyê xwe û du ji hevalên Emerikan (mêr-jin) bî hevra çûn Filma Rê (Yol). Hewşa sinemê tîjî bîbû. Eva cara duwemin bû, wekî min lî film mêze dıkır. Dema film qediya, em ji hêdi-hêdi jî sinemayê derketin. Jîna kurxatîyê min xanîmeke rûken bû. Dema em jî dêri derketin, min dina xwe dayê, dêmên wê tal û tırş bûne, çavê wê sor bûne. Vê yekê ez bînteng kırım, min jêderxist wekî rewşa welatê me, jiyana welatê me dilê wê pîr eşandibû. Di dawiyê da, min jê pîrsi "Te jî film çî derxist?" Wê bî dilekî şkesti gote min, wekî "Lî Tirkîyê mirov bibe kurd û jin bî rasti pîr zehmete".

TENGEZAR

PIRSA KURDAN DI TELEVIZYONA ELMAN DA

Televizyona Elmanya Rojava ZDF'ê di roja 24.7.1983'an da filmeki 90 deqîqan lî ser Kurdan nişan da. Ev filma bî destê filimkar Ulrich Tilgner û Thomas Giefert da hatiye kışandin. Navê film: "KURD; GELEKÎ JI HEBÛNA WÎ RA DESTÛR NAYÊ NIŞANDIN". Zordestiyên lî ser gelê Kurd, belengazi, xîzaniya gelê me û hêrs-rîka gelê kurd lî hemberi kolonyalîstan di film da pîr berbiçave. Hemû kurdên lî Elmanya Federal dîminin, roja film di televizyonê da hate nişandan, hemû ber televizyonên xwe rûniştin û vi filmê delal mêzekerîrîn. Paşi listina film, gelek kurdan lî ser navê televizyona ZDF'ê nameyên spasdariyê şandin.

Nûçegihanê Roja Nû
Lî Elmanya Federal

Zımanzaneke Kurd ZERA ÛSIV

KURDOX

Cıvata Yekıtiya Sovyetan bı zane, pıspor û pêşekzanên mezin va gelek navdare. İro sed û pênci netew dı bın ala sor da , dı bın baş kên wekhevîyê da bı xweşi jiyina xwe dıdın ajotın. Sistema sosya list çawa tê zanin cudabûnê dı nav gelan da nas nake, çı neteweyên piçûk çı neteweyên mezin. Jı van gelên piçûk yek ji gelê meye. Kurdên lı Sovyet iro nêzkaya 300 hezari tên hesabandin û lı ser axa pênc komarên Yekıtiya Sovyet belavbûne. Lê, ev belavbûna bı malavabûna politikaya durust û rast va aloz (tevlıhev) nabe. Çarelekırın jı pırsên netewan ra jı zûda pêk hatiye. Jı van pırsan yek ji yek ji tunebûna newekheviya navbera jin û mêrandaye. Êdi dîbendi navbera jin û mêran da nemaye. Jinên Yekıtiya Sovyet bı rûmeti û bı çalaki rex mêran, dı pêşketina cıvaki da paydarın. Dıroka vi welati bı van misalan va zor dewlemende.

Keçên me ji, xwe ji keçên dın bı kêmıri nabinın. Ew bı hemû hêzên xwe va, dı warê huner, çand, zıman da, jiyina xwe raberi pêşketina gelê me dıkin. Jı vana yek ji, keça jir û jêhati, rewşenbir û zane ZERA ÛSIVE. Em dıxwazın dı vê gotara xwe da lı ser jiyin û kar-barê vê keça zımanzan bısekinın.



Xûşka me ZERÊ keça Arif Ûsive. Bavê wê paleti dıkir. Zerê hên şeş sali bû, sêwi ma. Zerê dı piçûktiya xwe da pır jı xwendinê hezdıkir. Wê lı bajarê Tıblisê dest bı xwendina xwe kir û bı serfirazi wê xwendina xwe lı wir ajot. Paşê wê xwendegeha xwe bı nişana Zêrin va xelas kır. Zerê mıraza dilê xwe bı cihani.

Û dı sala 1954'an da dıbe xwendekara fakûlteta rohilatzaniyê lı Leningradê û dı beşa İraniyê da dıxwine. Zerê dı sala sısiyan da dest bı xwendina zımanê kurdi kır û lı bal mamoste Qanadê Kurdo gihışt. Dı sala 1959'an da wê fakûltet bı şehnazi (lıhevhati, xormonik) xelas kır. Jı ber ku Zerê ewqas jir bû mamosteyên wê pêşneyarkırın ku, ew xwendina xwe hın ji pêşta bıbe. Zerê bı daxwazeke gewre û bı viyan (evin) hemû giraniya xwe dıde lı ser

xwendinê. Zera Ûsiv dî sala 1956'an da lî bal Qanadê Kurdo, lî ser "Pêşnav-Paşnavên Dî Zaravê Sorani da" xebateke zanisti pêktine û dibe doktorê zımanzaniyê. Pışti wê yekser Zerê dibe karkerê institutuya rohilatzaniyê (beşê kurdzaniyê). Ew heta niha jî lî ser zımanê kurdi xerik (mijûl) dibe.

Pêşekzana jêhati û Qanadê Kurdo bî hevra ferhenga zımanê kurdi rûsi amadekirin û dî sala 1983'an da jî ew hat çapkırin. Lê, Qana dê Kurdo û Zera Ûsiv dibêjî ku, pêwiste keda hın hevalên Kurdên bî sorani zanin jî neyê jîbırkırin. Jî ber ku wan hevalan alikari ke mezin dî amadekirina vê ferhengê da gihandine me, wek; M.Xezne dar, Kerim Eyûbi, K.Mezeher, Cemşid Heyderi û hın kesên dın.

Zerê dî sala 1970'an da dest bî xebateke nûh kır û lî ser devoka Sûleymaniyê karên xwe fireh kır. Wê dî sala 1976'an da, ew xebata xwe bî navê "ZIMANÊ WÊJEYÎ NÛJENBAR YÊ KURDÊN IRAQ" qedand. Zerê, jî aliyê dın da dibêje ku, pêwiste ez alikariya kurdnasa Ûrîs İrina Sımırnova dî vi kari da birnekım.Naveroka vê pirtûkê lî ser rêzımana (gramatik) zaravê sorani (navça Suleymaniyê) ye. Pêşekzanên mezin İrina Sımırnova û Kawıs Qaftani baweriyên xwe lî ser vê pirtûkê weşandin û ew xebata hêja dıtın.

Zane û pispora dilgerm, welatperwer gelek karên gırıng, dî warê wergerandinê da pêkaniye. Wê, pirtûkeke hêja bî navê "Tekstên Folklorı Kurdiya Bajûr" wergerandiye zımanê rûsi. Dî hundırê 210 rûpelan da, gelek çirok, metelok, lêderxıstınok û efrandinên dın cih girtine. Ev kara careke dın jî, jî aliyê Zerê da jî zaravê Sorani hatiye wergerandin lî ser tıpên latini. Ev pirtûkê dî sala 1984'an da çap bibe.

Zımanzan Zera Ûsiv jî sala 1979'an vırda lî ser rêzmana Mewlewi dıxebite. Zerê dibêje mın ew kara hıldaye ser mılên xwe, jî ber ku hın zımanzanên dın, wek D.N.Mekenzi, R.L.Saflov dibêjin û dıniwisin ku zaravê "Hawrami" ne jî zaravên kurdiye. Disa Zerê dibêje, weki em dıxwazın van zımanzanan bıdın bawerkırinê zaravê "Hewrami" zaraveki kurdiye, çimki em bî xurti û baş dızanın ku ew lî ser şaşıyêne.

Zera Ûsiv hın gelek karên dıne hêja û bî nerx kırine, wek wergerandina çend çirokên MAM MEHEMED MEWLOD lî ser zımanê rûsi.

BENDÊN PÊŞIYAN

Em li jêr çend mesele û metelokên kurdi pêşkêşî xwendevanan dikin. Ev bendê pêşiyên an gotinên kal-bavan ji aliyê xwendevanê me NAZO'da hatine berevkirin, wi heta niha 708 bendên pêşiyên di nav kurdên ku li dorberê ENQERE dijîn, cîvandîne û angori sistema alfabetîk ew hemû mesele û metelok li du hev rêzkirine.

Agır da kozê, xwe da fêzê
An mêrê baş be, an bî bîvîr be, an bîmîr û xelas be
Bîra baş be, bîra dereng be
Ber çem kani çê nabe
Derê xwe kilit bike û cîranên xwe dîz dernexe
Bîra li bîra çî kîriye, vegeziye hemêz kîriye
Dînik jî dînikan û imam jî meyîtan hez dîke
Dostî bî du piyan va dîke, bî pîkî va nabe
Genîm genîme, nabe ceh
Gurê gerok, bîrçî namîne
Gur jî roja mij hez dîke
Heta av were êş, çavê beqê dîteqe
Hespa xurt, siwariyê xwe li rê da nahêle
Hesp dîbeze, siwar besnê xwe dîde
Hesp, dî şûna kerê da nayê girêdan
Hez bike jî mîn, hez bîkîm jî te
Jî behrê derbazbûn, newalê da xenîqîn
Jîn heye mîrov dîke wezîr, jîn heye mîrov dîke rezîl.
Kerê ra gotîn: "Çavê te ronî bibe, kurîkeki te bûye" got "Heta ev bar li ser piştê mîn be, heft kurîk bibe çîra"
Kes mîrovan ra malê çê nake
Me got "lêxe" negot "bîkuje"
Rîndiyê bike, bîra rîndî were pêşîya te
Rovî dîgere, tê dor mîrişkan
Tîşteki dest dîke, dak û bav nake
Zarokê bê dê, navîka xwe bî xwe jê dîke
Zarokê nebûyî ra, derpê nayê dirûn

ME JÎ

Me jî, şer kîriye, serî rakîriye
Me jî li çîyan al bakîriye
Heyman derbaz bûn bî şîn û girî
Ku em dereng man sedem netîrse
Here hevalo, jî çîya bîpîrse !

Me jî, hezkîriye, me jî dîl daye !
Em jî herîkîn, me jî pêl daye
Me ax avdaye, deştê gul daye
Ku em dereng man sedem ne tîrse
Here hevalo, jî deştan bîpîrse !

Me jî xwendîye, me jî nivîsandîye
Me jî reşandîye, me jî çêrandîye
Me jî das kîriye, me jî hêrandîye
Ku em dereng man sedem netîrse
Were hevalo, jî mîn bîpîrse !

N.AZAD

KOMCIVINA KURDOLOGAN

Beri çend mehan kurdnasên ku lî Yekitiya Sovyet dîminin, dî nav xwe da kombûn. Ev hemû kurdnasan (kurdolog) lî ser pîrsên vekolin û lêgerina dirok, çand û zîmanê kurdi sekinin, baweriyên xwe diyarî hev kirin.

Dî komcivîne da cara pêşin serokê koma kurdnasên Leningradê lî ser pêştaçûyîna û rewşa (hal-hewal) Kurdnasiyê lî Yekitiya Sovyet dengkir. Ewî dî gotara xwe da, bî dûr û dirêj lî ser vê pêştaçûyîna kurdnasiyê yeko-yeko ramanên xwe got. Heta nîha kijan kesan çî lî ser dirok, çand, zîman, edebiyat û etnografya netewê Kurd nîvisine, pêşketin, kêmasiyên zana û xebatkaran dî vi wari da çîne, ew pêwîstîna çî bîkin ku kurdnasiya Sovyet şûnda nemine, wek van pîrsan Prof. Qanadê Kurdo ser gelek pîrsên dî ji peyîvî.

Paşî gotara Qanadê Kurdo dor bî dor kurdnasên dî ji lî ser pêştaçûyîna kurdnasiyê ramanên xwe pêşkêşkirin. Jî wana her yekî lî ser pîrsên cuda-cuda dengkirin, misal :

Ş.X.MIHOYAN: Kurdnasiya Ermenistanê û pêştaçûyîna wê.

M.A.GASRETYAN: Xebatên lî ser diroka Kurdan.

O.CELİL: Lêgerina Kelepûrê Kurdan.

M.S.LAZAREV: Vekolin û Lêgerina Şerê Azadariya Neteweyê Kurd.

N.A.XALFÎN: Diroka Lêgerina Mêjûyê (Terix) Kurdan.

O.Î.JEGALÎN: Karên Lî Welatên Rojavayê lî ser Kurdan.

Z.A.USUPOVA: Vekolinên Lî Ser Zarav û Devokên Kurdi.

Î.A.SIMÎRNOVA: Lêgerina Fonetika Kurdi Bî Çaveki Diroki.

K.R.EYÛBÎ: Helbesteki Bî Zaravên Gorani û Mûkri.

R.L.SABOLOV: Rewşa Zîmanê Kurdi Lî Kurdistanê.

K.ANQOSÎ: Lêgerinên Lî ser Êzidiyan.

L.PAŞAYÊVA: Vekolina Etnografya Kurdan.

C.CELİL: Materiyalên Zîmanê Ermenî Lî Ser Dirok û Etnografya Kurdan.

AVALÎANÎ: Cêkîrîna Hevokên (cumle) Kurdi.

K. MÎRZOYEV: Pevgîrêdanên Edebiyata Ezerbeycan û Kurdan.

Paşî pêşkêşkirîna van gotarên zanîstî û gîranbîha komcivîna kurdnasên Yekitiya Sovyet bî dîlxweşî xelas bû.

NÊHIRVAN

50saliya tiyatroya kurdi

Çawa Bûroya Nûçan lî Swêdê diyar dîke, wekî Şanoya (Tiyator) Yekane lî Cihanê ya Kurdi dîkeve 50 saliya xwe. APN- prestjansten Novosti, lî Swêdê bî zîmanê Swêdi derdîkeve, dî hejmara 189'an da dîde kîvşê, cara pêşin lî Elegezê şanoke bî navê "Mem û Zîn" hat listin, paşî vê bûyera çandî 50 sal derbaz bûn. Disa dî bînya vê nûçê da lî ser pêşketîna kurdên Ermenistanê, dî warê çand û huner da hatiye seknandin.

dengbêjeki kurd YÊZDÎNÊ BOTÎ

BEŞİR BOTANÎ (Swêd)

Stran:- Yezdînê Botî

Dengnivîs:- E. Botanî

Ge- lê me kev- nû mer- ce (.).
we- la- tê me qî- ya ye

ME RÊ BERZE KIR

YÊZDÎNE BOTÎ KIYE ?

Yêzdînê Botîni dengbêjeki kurde û bî navdare. Dî nav tore, huner û çanda me da ew ciheki giranbîha û bilind digre. Ew dengke, jî dengê hunervanên me. Ez helbest û awazeki Yezdînê Botîni bî navê "Me Rê Berze Kır" pêşkêşî xwendevanên kovara "Roj-ja Nû" dîkîm. Ez hêvidarîm ku, hûne pûte bî belavkırîna hunera kurdi bîkî, ya ku roj bî roj tê dîzin, jî bira diçe û piştra wunda dibe.

Yêzdînê Botîni, dengbêjeki kurde û jî rûniştvanên bajarê Şernexêye. Dîbêjin ku, dema serhildana Şêx Seyid destpêkır, ev dengbêja nêzîki 25 salî bû, paşê ew wunda bû, kes jî nîzane ew çû kiderê û lî kiderê ma. Tenê mirov dîkare bêje ku Yêzdînê Botî dî navbera 1901-1904'an da hatiyê dîne û pişta sala 1925'an deng jê derneketiye.

Ez dîkarîm bêjîm ku ne tenê Yêzdînê Botî dengbêjeki kurde bû, lê belê bî hezaran hebûn. Mîxabîm ku zanayên me guhdarîke fîreh nedane ser hunerê xwe û jî bo parastîna çand û hunerê xwe zêde nexebitîne.

*Gelê me kevn û merde
Welatê me giyane
Daxwaza me zêrerde
Gundino ha gundino
Nezani kul û derde
Kul û derde nezani*

*Ulm; hîzr û viyane
Welatê me giyane
Hewcene bo jîyanê
Gundino ha gundino
Şîni, me berzekır rê
Me berzekır rê.*

*Zaneyên me kurdane
Welatê me giyaye
Kîtêbên me çirane
Gundino na gundino
Xani pêşya hemyane
Pêşya hemyaye Xani*

Hîzır : Raman
Jîyan : Jîyîn
Berze Kırın : Wunda Kırın
Vîyan : Vîn, Evin, Xwestîn

Ku sûk ev sûk be...

LEZGÎN

Çiya bılındın lı hındama Horişanê û ew bı geliyên pır kûr jı hev diqetın. Gund, gom û mezra mina stêrkên ezmanan belav bûne lı van çıyan. Lı wan gund û mezran cure-cure eşir ciwarbûne.

Sal danzdeh meh çete û firar kêm nedibûn lı ser van çıyan. Hınekan jı wan dı şerê eşiratiyê da mêr kuştıbûn û bı serê çıyan ketıbûn. Hınekan jı keç revandıbûn, ki jı hebûn ku avitıbûne ser qereqolên romê. Qefle-qefle cendirmên romê lı pey wan bûn. Dı destûrên eşiratiyê da pır tiştên nexweş û dijar hebûn. Dı rojên oxırmê gıran da peyayên bê mal û milk, gundiyeş belengaz hev dikuştın. Wan hev dikuştın, dengbêjan jı kılam dihelandın ser serekên eşıran. Lı wan deran revandına keçıkan ne şerm bû, lê dı nav vi işi da kuştın û mal wêrani hebû, belengazi û stuxwari hebû. Pez û dewar jı dihatın fırotan keç ji... Jı xwe zılma 'roma reş' jı qet nedihate kışandın.

Bıroyê Dıbo jı gundeki rasta Horişanê bû. Axan zeviya bavê wi jê standıbûn lı ser xwe tapi kırıbûn. Ne tene zeviya Dıbo jê standıbûn; canê wi jı jê standıbûn. Dema ku Dıbo hatıbû kuştın, Biro heyşt sali bû. Wi dı zarokatiya xwe da, ew kin û rık dı hundırê xwe da xwedıkr. Seri jı gıre-gırê axan ra qet xwar nekır. Dı dawiyê da wi jı mêr kuştıbû bı serê çıya ketıbû. Lı dora xwe çend kesên nola xwe fırar komkırıbû. Wan kesan jı gırdava kul û belan para xwe gırtıbûn, bı serê çıyan ketıbûn. Çıya jı xwe ra kırıbûn parêzgeh. Rêbirin û şêlandın bıbû karê wan. Jı wan ra qef la Biro dihatê gotın.

Lı wan çıyan qefleke dın jı hebû; Siloyê Kor û peyayên wi. Ev herdu qefle carna bı tevayi diçûne şêlandinê, bı hev ra rêbiri dıkırin.

Rojeke payizê, berbı êvarê kamyonek lı ser rê xwiyakır. Rê jı axê bû, mına tiremareki çiv didane xwe, geh hevraz dibû geh berjêr. Kamyon hêdi, lı dû xwe toz û fısilidûman radıkr û dı aliyê şıkefta fırarın da dihat. Barê kamyonê ırtı bû. Jı İstenbolê, jı dıkana Remezanê Sêrti ra ırtı dıanı. Peyayên Biro û Siloyê Kor çarali dor lı kamyonê gırtın. Pêşi lı kamyonê birin. ırtı jı kamyonê anıne xwarê, lı ber zınareki cêrge cêrge danıne ser hev. Şofêrê kamyonê sıpiçolki bıbû jı tırsa. Remezan pêşiyê pır lavakır:

- Geli camêran ez ketıme ber bextê jin û zarên we...! Geli mêrxasa ez axa bıne piyê we dıxum, têra jin û zarokên xwe bıgrın. Xwedê hatiye rıçayê, dıkana mın vala maye. Mın berdın ez guneme.

Gunebûna Remezan 'efendi' qet jı rewşa wi diyarnedıkr. Takara stuyê wi qalınd bû, zıkê wi niv mêtro jı ber çübû. Taxımek kincê qumaş lı ser bû, dıbrıqi. Qıravateke rınd bı stuyê wi va bû. Tu tiştêki wi mına yê fı raran nebû. Lı bajêr xaniyeki wi yê du qat hebû û dıkana wi mezın bû. Tu careki naskırı bû. Bırayê wi kışê xwe tıji kırıbû û mala xwe jı wan deran bırıbû. Lı İstenbolê otêleke tûristik standıbû. Agahê van jı vê yekê hebû.

Remezan xwast disa şansê bıcerıbine. Patısqeki Emerıqaniyê kesk jı erdê rakır û got:

- Ev şaşka resûlallahe, hûn destê xwe jı pêşıra mın berdın. Ma qet xofa xwedê lı ser we tune gıdi ? Musade bıkın ez malê xwe bıherım.

Remezan mına vızık lı dora ırtı û kamyonê dızviri. Wek gamêşeki ba harê tor, kef bı deva ketıbû. Dıçû dihat toz jı ber piyên bı radıbû. Lê xên jı lavakırınê tu tişt jı destê wi nedıhat. Fırarın bı awırên pis lı Remezan dınhêrin. Qet gunê keseki jı wan pê nedıhat. Gelek jı wan fırarın wextê çûyi anıne ber çavên xwe. Dema ku diçûne dıkana Remezan, bı

deyn jê pîrtî dîxwastîn, wi bî deyn nedida wan. Dema ku bîda ji wek xwî-
na xwe bîha bîha difrote wan. Lê iro dêla wi ketîbû destê wan. Duh li sû
ka bajêr Remezan efendi wan dişêland bî navê ticaretê; iro ji li sûka çî
ye wan ew dişêlandîn.

Idi roj çûbû ava. Tariyê xwe dî ser çiya û baniyan da berdabû. Rojê
şûna xwe dabû hivê. Hiv çar bejnan bîlînd bîbû jî serê çiyê. Remezan ,dest
û pê grêdayî li ber zînareki dirêjkirî bû. Serê fîraran pîr êşandîbû ku,
wan jî ew usa tewlandîbûn. Şofêr li ser kevireki rûniştîbû. Tîrsa wi ne
girtîna kamyonê bû, ne ji ya qumaşê Remezan bû. Ne kamyon ya wi bû, ne ji
pîrtî. Lê canê şîrin yê wi bî xwe bû. Dema Siloyê Kor û Bîro pazdeh - bist
gavan jî kamyonê dûr li ser piyan, derbar parevekîrîna pîrtî dipeyîvîn, şo
fêr xwe qincilokî kirîbû. Mina cûlixêke bask şikestî ku jî nav ava cemîdî
derketîbe, xwe civandîbû ser hev. Carna bî çavên tîrsiyayî dîxwast rûyê fî-
raran jî hev derxe, lê ronahiya hivê têrê nedikir.

Carekê ji nişkê va gullek teqiya. Şofêr vecîniqî, dev û qırîk li wi
zuhabû. Wî usa bawerdîkîr ku gulle berdabûne wi. Nivmîrî xwe li erdê dirêj
kîr. Axa hişk bî neynokên xwe pencerû dîkîr. Dî nav xoydanê da mabû. Li bî-
rîna gullê digeriya li ser cendegê xwe. Lê tîşteke pê nehatîbû. Ev tîrsa me
zîn li ba Remezan jî peydabîbû. Lê tu tîşt bî wî jî nehatîbû.

Hevalên Siloyê Kor û Bîro giştan gulle dabûne ber. Siloyê Kor para zê
de dîxwast. Sedem jî bî umîr mezinbûna xwe nişandîda. Lê hevalên Bîro pîr-
tîr bûn. Wî jî ew sedem nişandîda jî bo para zehf. Herduyan jî wek bîzînen
bî rîk piyên xwe dabûne erdê para mezin dîxwastîn. Paşê çawa bû jî nişkê
va newal wek sîrsûmê dew bête kîlandîn, bî dengê kelaşînkof û M-1 tîji bû.
Newal kûr bû. Dengan deng didane hev. Dengek dîbû sê-çar deng. Lû-
lê tîfîngan mîrîn vedîreşîyan. Paşê deng hat bîrîn. Teqe-reqê cih da bê-
dengiya mîrînê. Kûçîkên gundên rastê li ser hev lê dîxîstîn. Refeke qu-
linga dî ser wan ra derbas bû. Berbanga sîbê nêzîkîbû.

Li ser zînanan çend laş (cendeg) dirêjkirî, dî nav xwînê da mabûn. Cih
ciyan stêrkên ezmana jî cihên xwe dîşîqîtin, pare-pareyî dîbûn dîketîn û
jî ber çavan windadîbûn. Gelo evana stêrkê wan kesên kuştî bûn?... Ev ba
weriya han jî berê da dî nav gelê vê hîdamê da hebû. Zanebûna wan ser
astronomiyê tunebû. Hertîşteki jî zanebûn û irada wan der, şîrovekirîne-
ke xweye derfizîki hebû. Mellayên gundan alîm bûn. Şêxên şîreza doxtor
bûn, professor bûn. Nivîştên şêx û mellan dermanê hekîmî bûn. Şîrovekirî
na alemê û hebûnê karê mellan bû. Mîzgeft laboratuar bûn. Malên şêxan
nexweşxane bûn. Gundiyên belengaz jî nexweşên wan bûn. Axa şêx û "baş-
efendi" yên romê endamê mehkeman bûn. Eşîra here mezin dewleta romê bû,
ku dîkarîbû eşîr berdana hev; dîkarîbû bî şev bîkuştî bî nav rojê jî bî-
çûya serxweşiyê... û jî xwe usa jî dîkîr. Şîreza bû dewleta romê... x-
ayîn bû. Wek eşîrên rûniştvan pey tîştên piçûk nedîket. Eşîreke piçûk ne-
dîda ber bîna xwe. Jî giştan ra xwe dost nişandîda, lê dijminê hemîyan
bû. Li ser rê û çîyan rêwî nedîşêlandîn, çiya bî xwe dişêlandîn...

Bî kurtî serê we neêşînim, em veqerîna bazara pîrtî li sûka çiyê. Pîş-
tî kuştîna çend kesan jî herdu alîyan, Bîro û Sloyê Kor disa hatîn ba
hev, jî bo ku hev îkna bîkî. Lê ew li hev nedîhatîn. Herdu alîyan jî
çend qurban dabûn. Lê paşê yek jî wan fîraran nêzîki herdu reisên fîra-
ran bû û got :

- Ezbenî jî bo xatîrê xudê hûn guh bîdîne me jî, da ku em jî ramana
xwe bêjîn. Emê heta çî wextî li bendeyê parevekîrîna pîrtî bîmînin û hev
bîkujîn? Ez dîxwazîm yek jî me here gundê Kanîsîpiyê, Hecî Edo bîne. Dî-
be ku ew bî awayê şîretê me li hev bîne.

Ev pêşniyara han dî hişkê herduyan da jî rûnişt. Wan usa kîrîn. Du zî
lamên ku mala Hecî Edo dînasîn, tîfîngên xwe avitîne malên xwe, li hespan
suwarbûn, dî aliyê Kanîsîpiyê da berjêrbûn çûn. Pîştî qaseki herdu zîlam

l1 terkiya hev, Heci Edo ji b1 wan ra suwari hatin. Heci Edo selam da u ji ser pišta hespê peyabû. Silo u Biro b1 edeb çûn destê Heci Edo girtin u ramûsan. Heci Edo xwedî rûmet bû. Qedrê wi l1 her derê Horişanê hebû. Guman hebû ku wi firar l1 hev bianiya. Remezan ji b1 hatina wi şa bibû.. Dibe ku pirtiyê Remezan ji destê wan xelasnekira, lê çawa hebûya idi ew nedikuştin. Heci Edo got:

- Mêtroya min b1 xwe tunebû. J1 xwe usa pêwîst ji nine. Bira yek ji we çiqileki ji dareki bişkêne bine, em pirtî bîpivîn u belavkîn.

Yek ji wan çû çiqileki xiloxar, qasi mêtroûniveki dirêj ani, da destê Heci Edo. Heci Edo mêtroya nepivayi girt, ber b1 cêrgên pirtî meşiya. Lê hevaleki Silo ecêbmayi, b1 tehreki nefemkiri l1 wi nihêri u got:

Heci ev çawa dibe mêtro xwedê ji te razibe? Qasi bejneki dirêj u xiloxar...?

Heci Edo b1 awireki tînaz rûyê xwe l1 firaran guhirand u b1 dengeki nîmîz got:

- Erê qurban, ku sûk ev sûk be, divê mêtro ne piçûk be !

U destpêkîr pirtî l1 firaran belavkîr. Bîli Remezan herkes b1 vê belavkîrinê razî bû. Her çend Remezan canê xwe ji destê wan filitandibû ji lê pirtî ji dest derketibû.

Qumaşên lstenbolê u patîsqê Emerîqa gihiştibûne cihê bazara pirtî. Çi l1 serê çiyê, çî l1 sûka bajêr... Çi b1 kuştin, çî b1 aşiti...

KURDISTAN SPOR BÛ ŞAMPIYON



Kurdistan Spor paşî b1 serfirazi xelaskirina nivê pêşîn, d1 nivê duwemin da hîn ji xweş list u d1 nav koma xwe da bû şampiyon. D1 nivê duwe-

min da K. Spor tam d1 7 listikan da beşdar bû, 5 listikan da serket u 2 listik ji dane der. Çawa berpîrsiyarên Kurdistan Sporê diyar dîkin, weki sala pêşiya me da, wê vê serfiraziya xwe bîdî ajotîn.

Jİ NAV WEŞANAN

A LA TURQIA

Dı nav "Weşanên KOMKAR" da bı zımanê Elmani, "A LA TURQUIA" bı vi navi va pirtûkek der çû. Paşi hatına cuntaya faşist lı Kurdîstana Tirkîyê, dı vê pirtûkê da zordestiyên lı ser gelê me yek bı yek bı gelek dokumantan va tevayî hatîne rêzkırın. Cunta ya faşist, jı aliyê dın da lı dijî hebûna gelê me, çand, zıman û folklor me çawa bı xayîni heta nıha kar kırıye, ev yeka jı dı pirtûkê da cih gırtiye.

EV ÇIROKA XELAS NEBÛ

Lı Bexdayê pirtûkeke niviskarê kurd-Enwer M. Tahır hat weşandin. Dı nav rûpelên vê pirtûka bı navê "Ev Çiroka Xelas Nebû" gelek serpêhati û kurteçirokên lı ser jiyana gelê me cih gırtine.

AŞITI Û EVİN

Hunervan, sazband û berpırsiyarê kovara "Muzik û Huner" Beşır Botani bı Swêdi pirtûkek lı ser muzika kurdi nvısı. Navê pirtûkê "Fred û Kärlek" e. (Aşiti û Evin). Dı nav rûpelên pirtûkê da gelek wêne hene. Jı aliyê dın, pirtûkê da jıyına çend hunervan û sazbandên kurd jı cih gırtine.

HÊLİN

Bı destê niviskar û rojnemevan MAHMUT BAKSİ - ELİN CLASON bı zımanê swêdi romanek hat weşandin, ev romana bı navê HÊLİN 128 rûpela digre. Dı romanê da serpêhatiya keçeke kurd cih gırtiye, ev keçka bı navê Hêlin bı xwe jı mêrxaseke romanêye. Paşi çend mehan wusan jı ev romana wê bı kurdi bıghêje destê xwendevanan.

BAHAR TÊ SER ÇIYAN

Bı zımanê Ezeri lı Bakûyê berevokerê helbestvanên Kurdên lı Gurcistanê dıminın, hat çapkırın. Dı nav vê pirtûka bı navê "Dağlara Bahar Gelir" (Bahar tê lı Serê Çıyan), helbestên Baxçoyê İsko, Edoyê Cengo, Morofê Memeđ, Cerdoyê Esed, Ezizê İsko û Celilê Eşo hatîne weşandin.

FİLM RÊ(YOL)

"Ma Baweriya Mırovan Bı Ditînên Bı yaniyan Tê?" bı vi navi va, lı ser filmê "YOL" (Rê), lêkolineke psikologiyê jı aliyê xwendekareki Swêdi da hat amadekırın. Xwendekar KAJ ETTLİN GER dı vê xebata xwe da lı ser vê pırsê dısekine; weki paşi ditına film, kurd û kesên Swêdi bûyer û rewşa mêrxasên film çawa dıbinın û çawa film bir tinın. Bı kurti ev xebata lı ser pırseke psikologiyê "BİRANİN" ê hatiye pêkanin.

MA GAKÛVİ KÛÇIKAN OIXWIN?

Lı Swedê, jı bo zarokan, jı aliyê "Çapxana Çanda Kurd" da pirtûkek bı navê "Ma Gakûvi Kûçikan Dıxwin" hat weşandin. Niviskarên pirtûkê Lennart Frick û Jean Carlbrande. Pirtûk jı zımanê Swêdi hatiye wergerandin.

Înstutiya Kurdi lî Parisê dest bî derxistina bultenekê kîr, ev bultena bî zîmanê frensi, elmani, inglîzî, îtalyanî, kurdi û tîrkî derdikeve. Jî bo ronikîrîna kesên biyanî lî ser pîrsa kurdan, ev bultenê bî hejmar-hejmar (periyodîk) derkeve, heta niha 2 hejmar hatin weşandin.

Jî aliyê Awê Bali bî navê "Hawar" pirtûkeke helbestan lî Berlina Rojava hat çapkirin. Dî nav rûpelên pirtûkê da gelek helbestên şoreşgerî, we latparêzî û helbestên lî ser pîrsên cure-cure cih girtine.

DIMDIM

Weşanxana "Rojâ Nû" vê carê romana nivîskarê nav û deng Ereb Şemô çapkir, romana DIMDIM eva cara pêşîne wekî bî tipên latîni dîghêje destê xwendevanan. Çawa tê zanin navero ka vê romanê hîn bûyerên diroki vâ pêk hatiye.

ereb şemo**DIMDIM
roman**

STOKHOLM 1983

WEŞANÊN ROJÂ NÛ

Weşanxana "Rojâ Nû" çawa tê zanin heta niha gelek weşanên giranbîha û bî nerx gihande destê xwendevanên kurd. Paşî sazûna xwe jî sala 1980'an heta vîrda, weşanxanê 4 diwanên Cigerxwin dane çapkirinê û bî van efrandinên delal va, xwendevanên me gihîştin 4 pirtûkên helbestên Cigerxwin. Jî aliyê dîr da, weşanxanê çend pirtûkên nivîskarên Sovyet jî raberî xwendevanan kîr. Vîr şûnda, weşanxana "Rojâ Nû" hîn weşanên dî bernama xwe da jî wê bîde çapkirinê. Xwendevanên me van efrandinên hêja dîkarin jî vê adrêsa jêr bixwazin: Box 4038-141 04 Huddinge/Sweden.

- 1- Ronak, Diwana 4'an, Cigerxwin, Stockholm 1980
- 2- Zend-Avista, Diwana 5'an, Cigerxwin, Stockholm 1981
- 3- Kîlam û Mîqamêd Cîmeta Kurda, Cemîla Celîl, Stockholm 1982
- 4- Şefağ, Diwana 6'an, Cigerxwin, Stockholm 1982
- 5- Zozan, Casîmê Celîl, Stockholm 1982
- 6- Hêvî, Diwana 7'an, Cigerxwin, Stockholm 1983
- 7- Tarîxa Edebiyata Kurdi I, Prof. Qanadê Kurdo, Stockholm 1983
- 8- Dîmdîm, Ereb Şemo, Stockholm 1983



10 saliya mırına PAPLO NERUDA



Paplo Neruda û Allende

Helbestvanê Şiliyê PAPLO NERUDA, beri 10 salan çû dılovaniya xwe û ser mırına wira 10 sal derbaz bûn. Helbestvanê nav û deng lı hemû cihanê baş hatıbû naskırın û efrandinên wi bı gelek zıman hatın weşandın.

Paplo Neruda dı sala 1904'an da ji diya xwe bû. Bavê wi dı riya hesın da dıxebiti. Paplo Neruda dı 14 saliya xwe da dıbe berpırsiyarê beşa huner dı rojnema "La Manana". Pirtûka wi, ya pêşin "La Concion de la Fiesta" dı sala 1921'an da hate çapkırın. Paşê wi ji hev xweştır pır helbestên hêja nıvısı, lı Latin Emerikayê navê wi pır belav bû, lı dıji nepakiyê, zordestiyê û hêzên kevneperest dengê Paplo Neruda pır tund û xurt derket. Dı sala 1971'an da ji ber van karên xwe, wi xelata Nobelê girt û naveki hın ji hêja stend.

Helbestên Paplo Neruda iro bûne kılam-stran lı ser zarê hemû gelên bındest lı Latin Emerikayê, ew zêndiye û dı nav refên tekoşına van gelên mêrxas da dıji. Vê jındari û nemırinê Paplo Neruda helbesteki xwe da xweş diyari me dıke ;

BİRKIRIN NABE !

Wel tu ji mın bıpırsi tu lı kuyi
"Hertım wek berê" ezê bêjım.
Ezê lı ser zınarên ku erd pêçayi deng bıkıım
lı ser çemên dıkşın û wunda dıbın.
Ez tenê wundakırına çıvıkan-teyran dızanıım
hehra ku lı paş mın dımıne
Û yek ji xuşka mıne mezın, dema dıgırı
Ez van dızanıım.
Çıma van welatan bı cuda nav dıkın
Çıma ev rojana, lı pey rojên nûh dımeşın.
Çıne ev şevên tari, berev dıbın devan da
Çıne ev mırı?... .

ÇEND STRAN

Berevkar : NAVDAR

EVİN TINİM

HER BÊLİM

Her bêlım bêlım bêlım
Her bêlım lo
Her bêlım bêlım bêlım
Evdalım lo

Her sê malên newalê
Her bêlım lo
Her sê malên newalê
Evdalım lo

Taji berda xezalê
Her bêlım lo
Taji berda xezalê
Evdalım lo

Xwedê hıvza me bıke
Her bêlım lo
Jı tometên mala xalê
Evdalım lo

Her sê malên lı koşkê
Her bêlım lo
Her sê malên lı koşkê
Evdalım lo

Taji berda kewroşkê
Her bêlım lo
Taji berda kewroşkê
Evdalım lo

Xwedê hıvza me bıke
Her bêlım lo
Jı tometên mala xwişkê
Evdalım lo

Her bêlım bêlım bêlım
Her bêlım lo
Her bêlım bêlım bêlım
Evdalım lo

Kur: Keçê dinê lê lê zêran tinım way way
Keç: Kuro dino lo lo te nastinım way way
Kur: Keçê dinê lê lê bazın tinım way way
Keç: Kuro dino lo lo te nastinım way way
Kur: Keçê dinê lê lê fistan tinım way way
Keç: Kuro dino lo lo te nastinım way way
Kur: Keçê dinê lê lê guhar tinım way way
Keç: Kuro dino lo lo te nastinım way way
Kur: Keçê dinê lê lê qondere tinım way way
Keç: Kuro dino lo lo te nastinım way way
Kur: Keçê dinê lê lê EVİN tinım way way
Keç: Kuro dino lo lo te DISTİNİM way way

SERÊ MALAN

Serê malan darek lê lê darek lê
Dinê malan darek lê lê darek lê
Her malek da yarek lê lê yarek lê
Her xanek da yarek lê lê yarek lê
Serê yarê şarek lê lê şarek lê
Serê yarê şarek lê lê şarek lê

Serê malan gûzek lê lê gûzek lê
Binê malan gûzek lê lê gûzek lê
Her malek da qizek lê lê qizek lê
Her xanek da qizek lê lê qizek lê
Serê qizê zêrek lê lê zêrek lê
Serê qizê zêrek lê lê zêrek lê

Serê malan nokek lê lê nokek lê
Binê malan nokek lê lê nokek lê
Her malek da bûkek lê lê bûkek lê
Her xanek da bûkek lê lê bûkek lê
Serê bûkê mûrek lê lê mûrek lê
Serê bûkê mûrek lê lê mûrek lê

NAZEWICIM

Kaniya mezın pır pıçûke
Nazewcım, nazewcım
Keleş gewra te zaroke
Wellehi nazewcım

Par qiz bû, isal bûke
Nazewcım, nazewcım
Derdê mın ewa pıçûke
Wellehi nazewcım

Kaniya mezın kaniya cılan
Nazewcım, nazewcım
Teşt û sitıl nava mılan
Wellehi nazewcım

Keçê çavê te kor bıbe
Nazewcım, nazewcım
Mınra heye sebra dilan
Wellehi nazewcım

